

A. Melik Firat:

*Fîlozof û welatparêzê mezin, katibê  
Şêx Seîd: Fehmî Bîlal*

Rûpel 6 - 7

Seroka HADEP'a Çiğliyê Rahime Ülger:

*Jinên kurd û yên tirk  
hevalbendên hev in*


Rûpel 8 - 9

**Daxwaza dewletê:**

**NE MAF Û NE SAZÎ**

Rûpel 3

NAVEROK




4

Mehrdad R. Izady: Rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdî (1)



10

Metin Aksoy: Her kes bila li mafên xwe xwedî derkeve



11

Aynur Bozkurt: Leyla Qasim di dilê kurdan de wê her bijî

Ji Xwendevanan

*EZ xwedî û berpîrsê Weşanxaneyê Beybûnê me. Pirtûka Ekrem Cemil Paşa "Muhtasar Hayatım" me di 1992'yan de weşand. Piştî weşandinê pirtûk hate berhevkerin û der barê min de doz vekirin û salek û şeş meh ceza dan. Ez di 3'yê rêbendana 1996'an de ketim Girtîgeha Haymanayê, di 8'ê gelawêjê de cezayê min xelas dibe.*

*Mixabin ev, heftê û çend sal e ziman û çanda me kurdan qedexê kirine û em nehesibandine. Nivîskar û şairên kurdan û rewşenbîrên kurdan nivîsên xwe bi tirkî nivîsîne û heta dema 1980'yan hatine. Lewma gelê kurd ne bi zû ve ji kurdî dixwîne û dinivîsîne. Ji bo vê yekê deraxa nivîskaran û xwendevanan ne wekî hev e. Ya nivîskar li gorî deraxa xwendevanan, bini-vîsîne. Ya jî wekî rojnameya Welat di rûpela dawî de ferhengê têxîne.*

*Duyemîn her nivîskar hinek pîtan li gorî xwe bi kar tînin. Mînak: Gundparêz û cerdevan. Ev pîta cerdevan ji ku hatiye nizanîm. Kîjan rast e? Hinek nivîskar pak û vekirî dinivîsin, ez gelekî baş jê fêm dikim. Hinek nivîs jî heye pêk nayên. Ne ez tenê, bawer im gelek xwendevan pêk nayên.*

*Hêvidar im nivîskarê rojnameya Azadiya Welat li ser vê sedemê baldar bin. Çimkî armanca derketina rojnameyê ev e.*

IBRAHİM KÜREKEN  
GIRTİGEHA HAYMANAYÊ



Der barê xeta me ya weşanê de

MEHMET GEMSİZ

**B**i vê re, dibe 18 hejmar ku em li dû xwe dihêlin. Bi gotineke din, dibe 18 hefte ku em derdikevin pêşberî we. Di vê domanê (pêvajoyê) de, em bawer dikin ku xwendevanên me yên timî der barê xeta me ya weşanê de bûne xwedî agahî û naveroka rojnameyê nas kirine.

Bûne şahid ku gelek gotar, nûçe, hevpeyvînan cihêreng û hwd. hatine weşandin. Bi taybetî di warê hevpeyvînan de ev yek xwe pirtir eşkere dike. Lewma, em dixwazin ji bo xwendevanên xwe yên nû, ku car caran an jî hê nû Azadiya Welat dişopinînin (taqîb dikin), der heqê xeta siyasî ya weşana xwe de tiştinan bibêjin.

Di serî de em vê bibêjin ku em xwediyê rengê neteweyî ne. Em pîr-rensî û pîr-dengiyê tiştê siruştî (tabîî) dibînin. Ji her bîr û baweriyê re, ji her fikr

û ramanê re em vekirî ne. Bi şertê ku ew hev neêşînin û hev rencîde nekin.

Bi kurtasî, çi tiştê ku feydeya wê ji tevgera azadî ya gelê me re hebe, em pê re ne. Em li ber wan tiştan radibin ku ziyane digihînin yekîtî û wekhevîya gelan jî.

Me li jorê behsa hevpeyvînan kiribû; ku ew bi kesên "navdar" re hatine kirin. Bi piranî jî me ew di manşeta xwe de dane. Wan kesan bi taybetî (piraniya wan) di warê xwe de xwe dane naskirin, xwe dane qebûlkirin û derketine pêş jî.

Ji bo ku xwendevanên me wan jî nêzik ve baş binasin, raman û baweriyên wan ên der barê her mijarê de hîn bibin, em van hevpeyvînan pêk tînin. Nemaze li ser rewşa gelê kurd û meseleyên heytî çî difikirin, ji bo helkirina wan gelşan çî çare an çareyan pêşniyaz dikin û hwd.

Li ser raman û baweriyên wan em bi kurtî dikarin vê bibêjin: Di dawiyê de ew nêrin û raman ên wan in. Têkiliya me bi wan nîn e. Ew çî dibêjin em jî wan bêyî ku em têkilî bi wan bikin, diweşînin. Peywira me li wir ev e.

Çî nivîsên ku bi înzeya nivîskar, nûçevan û hwd. derkeve, berpîrs ew bi xwe ne.

Li destpekê jî me got, em xwedî xeteye weşanê ne, xwedî siyaseta û armanc in. Li dawiyê, yên ku naveroka rojnameyê diyar (tayîn) dikin em in; heyeta me ya weşanê ye. Em bergeha xwe fireh digirin; bawerîya me ev e. "Jimebûn û nebûn" jî bo me ne pîvan e. Gerek e ev hevoka me şaş neyê fêmkirin. Di vir de qesta me ev e: Ew kesên ku li dijî me, ramanên me, daxwaz û mebestên me bin jî, divê mirov karibe bi wan re hevpeyvînan çêbibe, nûçe jî çalakîyên wan bide. Ev tev jî bo mebesta ku em karibin wan qenc nas bikin.

Di neynikên xwe de em xwe dibînin; gelo di yên wan de em bi çî awayî tene dîtî? Ew me çawa tarîf dikin?.. Ev pîrs bi tenê jî mebesta me zelal dikin.

Bimînin di xweşiyê de.

Rewşenbîrî; welatparêzî

û fedekariyê divê

**Gelê me di nava agir de dijî, ev jîyan çî qas çetîn e, ew qas jî xweş û bi serfirazî ye. Rewşenbîr û hunermendên gel jî nava vê jîyanê derdikevin û bi pêş dikevin. Ev gotin divê şaş neyên fêmkirin ku li derveyî welêt rewşenbîr û hunermendên gel nikarin derkevin an jî tune ne.**

van 20 salên dawî çêbûye.

Belê, em kurd di qonaxeke nû re derbas dibin. Ev dem, bi xwîna bi hezaran şehîdan hatiye avakirin û paqij e. Gelê kurd, roj bi roj ber bi yekîtî û jiyaneke neteweyî ya nû ve diçe. Gelê me bi hemû alîyan ve hatibû parçekirin, ne tenê di warê neteweyî de, her wiha di warê kesantiyê de hatibû parçekirin. Lê roja îro bi tesîra têkoşîna rizgariya neteweyî hem yekîtîya gel û hem jî tiştê herî muhîm, jiyaneke nû di nav gelê kurd de tê çêkirin.

Kesên hişyar ewê zû tesîra pêvajoyê hilbigirin ser xwe û xwe ji jiyana kevneperest dûr bixînin û rolên xwe bileyzînin. Lê kesên ku hê naxwazin ji jiyana kevin dûr bikevin jî hene. Li gorî meşa azadiyê ya ku di Kurdistanê de dimeşe, di rojên nêzik de ev kes jî wê bi xwe bihesin, lê wext derbas bûye.

Têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê jî hemû kurdan re, rîya azadiyê vekirîye. Îmkan û firsendên mezin derxistiye. Her kurdê ku bixwaze xwe bi pêş bixîne, jê re heta dawiyê rê vekirîye.

Lê mixabin, kesên ku hê bi jiyana kevneperest ve girêdayî û ji bo dijîmin dijî, di welatê me de hene. Li aliyê din yên ku heta derekê hişyar bûne, lê vê


hişyarbûnê jî bo berjewendiyên şexsî û malbatî bi kar tînin jî hene. Dem bi dem em rûyê van kesan di civîn, konferans û heta di ekranên televîzyonê de jî dibînin.

Divê em baş bizanibin ku, rewşenbîrî, hunermendî û welatparêzî bi çend gotinên nazik û xweş; bi nivîsandina çend gotar û pirtûkan, bi beşdarbûna çend civîn, konferans û programên televîzyonê pêk nayê.

Rewşa gelê kurd a îroyîn bi xwe re kar û berpîrsiyên cuda tîne. Divê her kesê ku ji xwe re dibêje rewşenbîr an jî hunermend, li rewşa gelê xwe û pêwîstiyên wî baş binêre. Li derveyî jiyana gel kes nikare rewşa gel bizanibe û bine zimên.


Rewşenbîr û hunermendên ku bi rûyên xwe di nav gel de ne, li ku derê dijî, bila bijî ew dikarin gel hişyar bikin û daxwaziyên wî binin zimên.

Di vê pêvajoya dîrokî de her kurd, taybetî zanyar, rewşenbîr, hunermend û politîkvan, pêwîst e her gava xwe li gorî daxwaziya gel biavêje. Di pêvajoya têkoşîna rizgariya neteweyî de gundiyeke jî, şivanek jî û karkerek jî dikare xwe bike rewşenbîr û heta qehreman. Ji bo vê yekê fedekarî û di ruh de welatparêzî lazîm e.



**BELAVKARÉ** rojnameya Kurtuluşê İrfan Ağdaş li Alibeyköyê ji aliye polisan ve hate kuştin. Şahida büyerê Aynur Bedirê got: "Ev xort, li sikakê ji aliye du polisen sivil ve hate gulebarankirin, min xwest alikariya wî bikim, lê polisan nehişt. Pişt re ew avêtin erebeyaya xwe û birin." İrfan Ağdaş, xortekî 17 salî û xwendekarê lîseyê bû.

Ebûqatê malbata Ağdaş Ahmet Düzgün got ku, dozger nehiştaye ew bikeve otopsiyê. Rêxistinên demokratîk û İHD'ê büyer wekî weşeterekî bi nav kirin û şermezar kirin. Dîsa helwesta çapemeniya tirk, ku xwest wî wekî terorîst bide nîşan jî, hate rexnekirin.



**SEKRETERÉ** Giştî yê Yekîtiya Belediyeyên GAP'ê Ahmet Özer, li ser daxwaza wezîrê dewletê Ali Talip Özdemir li ser weşana TV û radyoyê bi zimanê kurdî raporek amade kir. Li gorî raporê li Tirkîyeyê 12-14 milyon kurd dijîn. Dîsa, li nebûna weşana bi kurdî lome tîn kirin. Her wiha tê diyarkirin ku MED-TV li herêmê ji aliye temaşekirinê ve di rêza yekemîn de ye û hem li gundan hem jî li bajaran her roj tesîra MED-TV'yê zêdetir dibe.

Dîsa di rojnameya Yenî Yüzyıl de roja 15'ê gulanê gotareke Mucahit Bilici derket. Ew jî dide zanîn ku gelê kurd MED-TV hem-bêz kiriyê û ew ji bo yekîtiya gelê kurd gavên mezin diavêje.

## NÜÇE

### DIK Beramberî aşiyê bombe

Gotineke pêşiyar heye, gelekî li rewşa dawîn a her du aliyan şerê li Kurdistanê tê. Dî-bêjin: "Merhemet, merezê tîne." Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, di 15'ê berfanbara 1995'an de ji bo ku şensêkî bide aşiyê, agirbest îlan kir. Tevî hemû provakasyonên wekî tevkujiya Basayê, kuştina du mamosteyên aşîxwaz ên li Meraşê û operasyonên tunekirinê, agirbestê dewam kir.


Lê, rayedarên dewleta tirk carekê rik li doza aşiyê girê dane, êdî ji bo xerakirina agirbestê çî pêwîst be, wê bidin kirin.

Tevgera kurd, gelek serkeftinan bi dest dixe. Di warê dîplomasiyê de mafdariya xwe bi raya demokratîk a dinyayê dide pejirandin. Li başûrê Kurdistanê, ne bi tenê berjewendiyên komara tirk, berjewendiyên Amerîkayê jî dixê talûkeyê. Lê xewn û xeyalên ku dewleta tirk li ser girtina Kanî Xulam û AKIN'ê didîtin, di avê de çû. Kanî Xulam di 15'ê gulanê de hate berdan. Kurdên Yekîtiya Dewletên Serbixwe, ji bo Kurdistana Sor dest bi xebatên nû kirin.

Li hemberî van tiştan, nedibû ku şerxwaz destvala bisekinîna; lewre jî dest avêtin provakasyona herî mezin, bombe xistin ci-hê ku Serokê PKK'ê Öcalan carinan lê dima. Lê ev jî bi ser neket. Tevî wê kirina hov jî, Öcalan diyar kir ku wê agirbest bidome.

Raya giştî ya kurd û raya demokratîk a Tirkîyeyê reaksiyon li hemberî wê kirinê nîşan dan. Rêxistinên wekî ERNK, YCK, YAJK, YRK, PKDW, Yekîtiya Hiqûqvanên Kurdistanê ev büyer lanet kirin. YCK'ê di daxuyaniya xwe de da zanîn ku, ew ji bo tohlildanê amade ne. Her wiha Serokê İHD'ê Akın Birdal ev kirin şermezar kir û da zanîn ku kêşeya kurdî bûye navneteweyî. Birdal gote ku kirinên bi vî rengî ji bilî zêdebûna xwîna ku tê rijandin, bi kêrî tiştêkî nayên.

# Daxwaza dewletê: Ne maf û ne sazî



**Dewleta tirk van demên dawîn bi xebatên sistematîk bi ser saziyên mafên mirovan ve diçe; ji ber ku kirinên wê yên der-mirovî eşkere dikin. Di vî warî de tu prestîja wê jî nemaye û Tirkîyê wekî îşkencexaneyê tê qebûlkirin.**

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AI) Civîna Danasînê li Stenbolê li dar xist. Kesên ku bi mafên mirovan re eleqedar in, roja şemiyê (11 gulan 1996) li Hotelê The Marmarayê amade bûn. Ew kes jî bo civîna Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî hatibûn.

Civîn bi axaftina endameke komîteya amadekar a Tirkîyeyê Özlem Sarıgüzelê, vebû. Li gorî agahiyên ku hatine dayîn, ev civîn ne civîneke taybet bû. Lewre ev civîn, destpêka rêzecerivînê li hin bajarên din bû. Piştî vî civînê, di 13'yê gulanê de li Enqereyê û li Mêrsînê di 15'ê gulanê de civînên bi eynî mebestê çêbûn.

Kesên ku wekî axêvger beşdar bûbûn, ji welatên wekî Çîn, Amerîka û Fasê bûn. Ew bi piranî li ser îhlalkirina mafên mirovan ên dewletên xwe rawestiyar û serpêhatiyên xwe anîn zimên. Di bernamaya civînê de gere çar endamên rêxistinê yên biyan hebûna; lê belê dewleta Tûnisê rê nedabû welatiya xwe Aîcha Dhaouadî (Ayşe Davudî) ku derve derveyî welêt. Ji ber vî yekê jî, ji xeynî wê sê kes amade bûn. Ji van sê kesan, Bryan Stevenson parêzerekî Amerîkayê, Dawûd El-Kadir ji Fasê û Mo Lîluo ji Komara Gel a Çînê beşdar bûn.

El-Kadir ê ku "16 salan hatibû windakirin", di axaftina xwe de zêdetir li ser jiyana xwe sekinî û diyar kir ku ev serpêhatî divê wekî nimûneyeke ji serpêhatiyên gelê Fasê bê pejirandin. Dawûd daxuyand ku di 1915'an de Fasê welatê Sahara Rojavayî îşgal û îlhaq kiriyê. Dawûd dema ku di 1976'an de tê girtin xwendevanê dibistana mamostetiyê ye. Ew jî wekî kesê din tê windakirin. Dawûd tevî 260 jin û mêrên Sahrayî yên mûxalîf jî ber çavan tîn windakirin. Heta 16 salî ew rewş dewam dike. Di nav salan de gelek zilm û tade lê tê kirin, wî li cihên cur bi cur digerînin. Ji hevalên wî 40 kes jî ber îşkenceyan dimirin. Serpêhatiya Dawûd jî bo guhdarên civînê ne xerîb bû.

Axêvgerê ji Amerîkayê ku xwe wekî parêzerê (ebûqat) mafan dibîne, rûyê rayedarên welatê xwe eşkere kir. Bryan Ste-

venson diyar kir ku li welatê wî jî mafên mirovan, bi taybetî jî mafên mirovên reşîk û xizan tîn binpêkirin. Mînakên Stevenson gelek balkêş bûn. Stevensonê ku wekî parêzerekî li dijî cezayê îdamê xebatê dike, da zanîn ku piraniya kesên ku li Amerîkayê cezayê mirinê lê tê birin, an reşîk, çermesor an jî koçber in. Parêzer Stevenson, bi serpêhatiyeke balkêş diyar kir ku Rêxistina Efûyê ji bo parastina mafên mahlûman e.

Mo Lihua, mamosteyeke ji Çînê bû. Ji ber ku piştigiriya xwendekarên Tianenmanê kiribû, hatibû girtin. Lihua bi sê salan hatibû cezakirin, piştî ku hatiye berdan derketiye Ewropayê û niha wekî penaber li Swêdê dijî.

Lihua'yê daxuyand ku nifûsa dewleta wê % 20'ê nifûsa cihanê ye, lê % 70'yê mirovên ku li cihanê tîne darvekirin ji Çînê ne.

Civîn bi pirsên beşdaran qediya. Hêjayî gotinê ye ku piraniya pirsan ne li ser axaftinên mênanan, li ser kirinên dewleta tirk ên li dijî mafên mirovan bûn. Her wiha, rojnamegerekî gotina doktorekî danîmarkî ku li Kongreya Amerîkayê ji bo Wezîrê Dadê Mehmet Ağar gotibû, bi bîra rayedarên rêxistinê xist, lê wan der barê vî gotina ku "Ağar îşkencekarekî super e" de, tu şîrove nekirin.

Pêkhatina civînê bi vî rengî gelekî girîng e, lewre çend rojan berî vî civînê rayedarên tirk li dijî rêxistinên mafên mirovan dest bi hin çalakîyên nû kirin. Dewleta tirk ji mêj ve gelek astengiyar derdixê pêşberî kes û saziyên insanî, wekî girtin û dersînokirina rayedarê Rêxistina Efûyê Helmut Oberdiek, sûcdarkirina gelek kesan bi hevalbendiya PKK'ê û heqaretên giran ku li parlamenterên ewrûpî hatin kirin.

Lê wan rojên dawîn komara tirk bi rapora Human Right Watch/ Helsinki gelek zivêr bû û zikreşiya xwe, bi tewra ku li hemberî Weqfa Mafên Mirovan (İHV) nîşan da, derxist rastê. Dewletê, ji ber ku rêxistinên navneteweyî ji agahiyên İHD û İHV'ê istifade dikin û İHV jî xebatê ji bo rehabilitasyona îşkencexwaran dike, berê



Bryan Stevenson

xwe daye van rêxistinên. Li gorî îdiaya dewletê, İHV rêxistineke derewîn e; bi saya xebatên xeyalî, pereyan ji saziyên navneteweyî distîne.

Bi vî awayî dewleta tirk dixwaze İHV'ê bigire. Ji ber ku rayedarên İHV'ê der barê kesên ku serî li wê dane de, agahiyan neda dewletê, gelek caran hatin darizandin. Di navbera salên 1994-95'an de, du caran li dijî İHV'ê doz hate vekirin.

Di sala 1995'an de jî cara yekemîn, Wezîrê Karê Derveyî bi zimanekî resmî xebatên İHV'ê rexne kir. Di rêbendana sala 1996'an de, ji bo pirsîyariya xebatên İHV'ê Wezîrê Tendurîstiyê, ji Wezîrê Ta Dadê, Saziya İstixbarata Neteweyî (MÎT) û ji polis agahî xwestin. Lê belê tu tiştêkî ji van pirsîyariyan derneket. Vê care jî dewletê dest avêt nûnertiya İHV'ê ya Edeneyê; der heqê Nûnêr/ Dr. Tufan Köse de doz vekir û pişt re ew sirgûn kir.

Niha jî büyerên bi vî rengî hê jî berdewam in, lê çalakîyên KT'yê bîfeyde ne. Ji ber ku li derveyî Tirkîyeyê tu prestîja wê nemaye, heta ji aliye Yekîtiya Ewropayê ve baş tê zanîn ku, KT wekî îşkencexaneyê ye û jî sedî sed haya rayedaran jî, ji kirina îşkenceyan heye.

Ji xeynî vî jî di civîneke Kongreya Amerîkayê de doktorê danîmarkî Dr. Inge Genefke, Wezîrê Dadê Mehmet Ağar, wekî serkêşe îşkencevanan da nasîn. Ev büyer jî nîşan dide ku, dewleta tirk li hemberî rêxistinên insanî şerêkî bêencam dimeşîne.

DÜZGÜN DENİZ

# Rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdî (1)

MEHRDAD R. IZADY

**D**anhev û sazkirina dîroka kurdî karekî demxwar e. Çi kêfxweşî ye ku sedema vê yekê cildên stûr ên çavkaniyên kevnare ne, lê nebûna wan nîn e. Pêşiyên kurdan wekî mirovên ku di serdîlka cografî ya Rojhilata Navîn a mezin de cih girtine û gelek kanên siruştî û mirov xistine bin destê xwe. Lewre jî bivê nevē têrî xwe ketine nav qeydên mirovên ku cara yekemîn bi karê nivîsandinê re daketîne. Her wiha kurd xwediyê diwarojeke hevpar in bi gelên Rojhilata Navîn ku civakên xwendê yên herî kevn in li ser rûyê erdê.

Heke ku kurd ji ramana qeydkirina dîroka xwe bi baldarî bireviyana jî, wan nikaribû ji qeydbûnê rizgar bibin, bi destê zanayên gelên li mezopotamyayê. Ji ber ku kurdan her tim têkilî, danûstandinên xwe bi wan re domandin. Şensê baş ew e ku ne kurdan dev ji karê nivîsandina dîroka xwe berdane, ne jî dîroknivîsên gelên cîran qeydkirina wan avêtine pişt guhê xwe. Bi kurtasî, rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdî ya lipaşmayî, ne ji ber nebûna materyalên lêkolînê ye, ji ber pîrbûna wan e.

Qeydên leşkerî û karsazî yên navherêmî ku li ser tehtan hatine nivîsîn û nivîsên dîrokî, dewlemendiya bermahiyên dîroka dema navîn û dema klasîk ên ku ji windabûnê rizgar bûne, karin alîkariya berhevkirina dîroka kurdan bikin. Di van çavkaniyan de dîroka kurdî kitekit hatiye qeydkirin û hema mirov dikare bibêje li her zanîngê û pirtûkxaneyê mezin ên cîhanê karin bîdaxistin. Dibe ku yek bi mafdarî bipirse: "Pêdiviya berhevkirin û nivîsandina dîroka kurdî çi ye, heke jixwe li wan deran amade be?"

## Li herêmê dîrok bi tomerî hatiye qeydkirin

Di hemû çavkaniyên dîroka berî dema nûjen de, dîroka kurdan wekî parçeyekî serpêhatiyên berfireh ên tomerî yên Rojhilata Navîn hatiye nivîsîn û qeydkirin. Di vî parçeyê cîhanê yê ku herî zû medenî bûyî de, dîrok kêma caran bi awayekî beşkirî û terxankirî hatiye nivîsîn da ku hin komên ji qewmekî û ku li ser yekîtiya zimên hatiye tarîfkirin, destek bike an jî biçûk nîşan bide. Bi tenê dema komeke nû ji nav ên din derketiye pêş, ji bo ku serweriya Rojhilata Navîn bike, (wekî erebên sedsala 7'an û moxolên sedsala 13'an) ev qayde hatiye şikênanandin, ew jî bi tenê ji bo demeke kin. Lewre jî cesareta ehmeqan pêwîst e da ku mirov têgînên civakî-siyasî yên qewmîyeta îroyîn ji bo civa-



V.F. Minorsky

kên Rojhilata Navîn ên berê, bifikire.

## Nivîsandina dîroka qewmî karê dewletan e

Ji bo van gelan baweriyên olî ku awayê jiyana aborî jî dida pey, ji bo pêkanîna hestên komeleyî, li pêş hemû faktorên din bûye. Hêmana zimên a ku ji bo ewrûpiyan girîng hatiye dîtîn (ji yewnana kevnare heta fransîzên nûjen), ji bo mirovên Rojhilata Navîn ên berî dema nûjen, gelek caran wekî tiştêkî li derî dêhna wan xuya dikir. Lê, binêrin li wê nakokiyê ku, tarîfa qewman a ku bi bandora ewrûpiyan derketiye holê û li qada navneteweyî li serê lihevkiyên çêbûye, li gorî wê diyardeyê bi tenê tê kirin.

Lewre jî van çavkaniyan derxistina parçeya dîroka Rojhilata Navîn û mîrata mirovahiyê ya ku bi taybetî malê kurdî-axêvan e; (çi hind-ewrûpiyên îroyîn û çi jî huriyên dema pêşîn) karekî gelekî giran e. Ji hin kes û komên

serbixwe wêdetir, ancax saziyên ku dewletek li pişt e, karin ji binê vî barî rabin. Komên herêmê yên ku niha xwedandewlet in dîroka xwe ya qewmî bi xebateke ku dewlet li pişt e, berhev kirine û nivîsandine. Dewletan bi avakirin û xwedîkirina akademyan û bi saya beşên hunera liberal a zanîngêhan dîroka qewmî-zimanî pêk anîne û navdar kirine.

## Netewe-dewlet, ji bo meşrûbûna xwe dîrokê çêdike

Bi rûdana doza dewleta neteweyî, li Ewrûpaya sedsala 19'an, mirovan giraniya ramana xwe dan ser qewmîyeta ku li ser yekîtiya zimên pêk hatiye. Sedema vê yekê jî xurtkirina meşrûbûna dewletên neteweyî bû, ku sînoren wê li ser vî yekîtiyê hatibûn danîn. Ji bo hikûmeteke neteweyî ev bû karekî pêşîn ê jênager bi du mebestan: Yek; ji bo nîşandayîna xwerûtiya qewmê xwe di dîrokê de, dudu pejirandina meşrûbûna

Heke ku kurd ji ramana qeydkirina dîroka xwe bi baldarî bireviyana jî, wan nikaribû ji qeydbûnê rizgar bibin, bi destê zanayên gelên li mezopotamyayê. Ji ber ku kurdan her tim têkilî, danûstandinên xwe bi wan re domandin. Şensê baş ew e ku ne kurdan dev ji karê nivîsandina dîroka xwe berdane, ne jî dîroknivîsên gelên cîran, qeydkirina wan avêtine pişt guhê xwe. Bi kurtasî, rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdî ya lipaşmayî, ne ji ber nebûna materyalên lêkolînê ye, ji ber pîrbûna wan e.

îdiaya li ser erdê ku ew wekî warê qewmê xwe diyar dîke.

Piştî vê yekê, dîroka kevn a tomerî dibe warê lêhûrbûnê ji bo komên qewmî yên taybet. Tiştên ku di belgeyên dîrokî de nîn in, lê tîz zêdekirin, an jî ku ne bi dilê avakarên van dîrokan in, jê tîz derxistin, bi kurtî dîrokê "çêkirin". Bernard Lewis di pirtûka xwe ya bi navê "Dîrok: Bibîranîn, veşartin, afirandin" de, bi mînakên eşkere nîşan dide ku "netewe" yên Rojhilata Navîn çawa ev kar kirine.

Dîroka qewmî ya kurdên bêdewlet ku ji hêza saziyên dewletî û ji piştgiriya aborî ya çînen mirovhez bêpar in, divê ji nav girseya çavkaniyên dîroka tomerî bê derxistin û berhevkirin. Êdî mirov qîma xwe bi naskirina serkeftinên hevpar ên mirovahiyê naynin. Ew dixwazin dîroka li gorî qewman terxankirî bizanin û serkeftinan li kiryarên wan par bikin. Kesên ku nikarin para xwe di nav van serkeftinan de destnîşan bikin, di dîrokê marjînal tîz daxu-

yandin; çanda wan bipêşneketî (prîmî-  
tîf) tê dîtîn û îdiaya wan a li ser xaka ku  
lê dijîn, cidî nayê girtin. Hemû mîratên  
qewmên ku li qadên jêrîn hatine bicih-  
kirin, dikevin muzeyên dîroka siruştî;  
cihê wan li muzeyên hunerê nûn e, an-  
cax muzeyên arkeolojîyê bi dest wan  
dikevin.

Serpêhatî û dîroka van gelan dibin  
warê lêkolînên antropolojîstan, civak-  
nas û dîroknas jê xwe dîr dixin. Ber-  
mahiyên tîkildarî wan valahiya di nav-  
bera hoveberî û şaristaniyê de, dadigi-  
rin. Di muzeyên dîroka siruştî de cihê  
wan “çandên prîmîtîf” li nik giya, hey-  
wan û madeyên din e.

Doza van gelan a xwerêveberiyê tèn  
paşçavkirin, ji bo xatirê hêzên împeryal  
ên ronîbûyî an jî li hemberî daxwaza îl-  
haqê ya “dewletên nûjen” ku wekî dî-  
werên li pêş bêaramiyê tèn dîtîn.

### Senifandina spekulatîf û kurd

Ji ber vê senifandina spekulatîf, ne  
tenê kurd, gelek çandên giranbuha yên  
kevnare jî mehkûmî marjînalîyê bûne.  
Îro, şaristaniya muhteşem a Amerîkaya  
Navîn tîdikoşe ku navê hoveberiyê jî  
ser xwe biavêje. Dûwajoyên şaristani-  
yên wekî maya, inkayan jî wekî kur-  
dan, ji ber ku ne xwediyê lobyîstên  
akademîk û finansorên dewlemend in,  
ketine derdê jidestbermedana kelepora  
xwe ya çandî ya dewlemend. Ji ber ne-  
bûna berhemên nivîskî yên li ser kele-  
pora kalikên wan, em pisporên biyan  
deynin aliyekî, ew êdî nikarin bi ciwan-  
ên xwe jî girîngiya raboriya xwe bidin  
bawerkirin. Her wekî kurdan, şaristani-  
yên maya, înkâ û aztekan jî hê li muze-  
yên dîroka siruştî tene pêşandan û ji  
aliyê antropolojîstan ve tene tarîfkirin.

Eynî senifandina spekulatîf di nir-  
xandina kalikên kurdan, huriyan de jî tê

kirin. Li ser vê bêmantîqiyê G. Wil-  
helm di berhema xwe ya bi navê “Nivî-  
sên Huriyan” de van tiştan dibêje: “Ji  
şaristaniyên kevnare yên herî girîng di  
dîroka Rohîlat de, hurî ne. Beramberî  
vê yekê jî agahiyên me yên der barê hu-  
riyan de (çi ji aliyê zimên, çi ji aliyê dî-  
rok û çandê ve) pir hindik in, li gorî  
agahiyên li ser sumerî, asûrî, hîtîti û he-  
ta kenaniyan.” Paşê Wilhelm xemgîni-  
ya xwe diyar dîke, ji bo ku tevî delîlên  
pêselmîn ên li ser girîngiya huriyan jî,

## B i rastî jî metoda senifandina spekulatîf bi awayekî neyarî, li dijî kurdan tê xebitandin. Nêrîna li kurdan a ku bi gotinên “eşîrên koçer” (em qala sifâtên wekî rêbir, hov û hwd. nekin) tê zimên, pisporên kurdolojiyê yên ku giraniya xebata xwe dane ser vê mijarê jî dixê bin bandora xwe.

hinek nirxandinên ku dibin sedema se-  
nifandina spekulatîf hene. (Wilhelm,  
1989; 1-9)

Tiştê ku ji bo rewşa lêkolînên der  
barê neviyên huriyan kurdan û kelepora  
ku wan li gencîneya mirovahiyê zê-  
de kirine de, ev e: Bi rastî jî metoda se-  
nifandina spekulatîf li dijî kurdan bi  
awayekî neyarî, hê jî tê xebitandin. Nê-  
rîna li kurdan a ku bi gotinên “eşîrên  
koçer” (em qala sifâtên wekî rêbir, hov  
û hwd. nekin) tê zimên, pisporên kur-  
dolojiyê yên ku giraniya xebata xwe  
dane ser vê mijarê dixê bin bandora  
xwe.

Di sala 1995'an de Thomar Boisê ku  
kurd xistine çapa duyemîn a Ansîklo-  
pediya Îslamê, li ser kurdan pirtûkeke  
navdar nivîsiye. Navê pirtûkê bi frensî  
“Connaissance des kurdes” yanê Nasî-

na Kurdan e. Ev pirtûk di bin navê  
“The Kurds” (Kurd) li îngilizî jî hate  
wergerandin. Di pêşgotina vê pirtûkê  
de Bois gotinên Minorsky ku di çapa  
yekemîn a Ansîklopediya Îslamê de  
(1913) cih digirin, dubare dîke. Ev ni-  
vîs li ser kevnarebûna kurdan û danûs-  
tandina wan a xurt bi xaka Mezopo-  
tamyayê re hatiye nivîsandin. Tevî vê  
yekê jî nivîskar, gotara Minorsky a rê-  
nîşandar fêhm nekiriye. Nivîskar ji bo  
danasîna civak û şaristaniya li Kurdis-

tekî çiqas hindik xwedan agahî be, ev  
qas wî tiştî di warê girîngiyê de dixê  
rêza dawîn. Pir dijwar e ku mirovek  
dev ji rihetiya tiştê ku dizane berde û  
bikeve zehmetê hînbûna tiştê ku nayê  
zanîn, heta dema nerastiya tiştê ku tê  
zanîn, êşkere bûbe jî. Wekî ku di hej-  
marên berê yên Kurdish Life de  
(No.4,1992) hatiye diyarkirin, ak-  
reolojîstan li Godîna li rojavayê  
Dînawerê hin cihên kevnare kolandin.  
Piştî van kolandinan li vê herêma roj-  
hilata Kurdistanê, hin bermayî bi dest  
xistin. Ev bermayî nîşan didin ku cara  
yekemîn rez li vê herêmê hatiye danîn;  
şerab û bîraya ji ceh jî, li wir çêbûye.  
Gelo kê ew tişt îcad kirine?

Diyar e ku tîrî û ceh berên xwerû,  
yên çiyayên Zagros û Torosan in, cara  
yekemîn li wir ber dane û tê zanîn ku  
şitlên mewe li avzêlên germ û li ser  
erdê bixwê yên destên başûrê  
Mezopotamyayê yanê Iraqê şin nayên.  
Tevî wê yekê jî arkeolojîstên ku bi karê  
kolandinê re tîkildar in di ser çanda  
kurdên kevnare yên çiyayî re qewaz  
didin û îcadkirina van her du beran  
dikin malê sumeriyên başûrê Iraqê. Li  
Godîne kûpên bîrayê di menzelekê de  
hatine dîtîn, her wiha li wir guleyên ji  
bo kevirkanên leşkeran jî, hebûne.  
Dîroknasên greko-romên ên klasîk vê  
metoda şerkirinê bi gelên zagrosî ve  
gîrê didin; bi taybetî jî yên jê re kurti  
yanê kurd tê gotin. (Mînak, Polybius  
V.lii.5; Livy; XXXVII. xl.9' Diodorus,  
XIV.xxvii.3) “Kevirkana Kurtiyan” ev  
her du peyv ji hev nabin di belgeyên  
kevnare de.


### Dûmahîk heye

Wergera ji îngilizî:  
SAMÎ BERBANG

Ev nivîs ji kovara Kurdish Life,  
hejmar 16 hatiye wergerandin.

## Zanîngeha Kurdistanê medrese (4)

CELALETTİN YÖYLER



Ji muntehiyî medreseyê Seyda Mele  
Seîdê Kurdî; ew jî yek ji ronakbîr û zan-  
yarên medreseyên Kurdistanê ye. Ev  
seyda çawa ku ronakbîr e, wisa jî gelper-  
wer û welatparêzekî bi nav û deng e. Lê pir  
mixabin piştî wefata wî, pir kesên ji  
armancên cur bi cur, ew seyda û zanyarê  
mezin di riya berjewendiyên xwe yên bi  
gemar de dane xebitandin. Hem jî li hem-  
berî gelê wî yê bindest û belengaz û bi  
navê ola îslamê.

Ew pir paqij û dadmend bû ji bo  
pêşveçûyîna hemû gelan. Çi dema ku ev  
rewşa wan sîmsarên bêwicdan, tê bîra min,  
ez dikim dîr bibim. Nemaze nûrcî û  
meleyên kurdan, ewên ku di gotinên  
“înemel mumînû ne îxwetin” (heger bi rastî  
bawermend bira ne), ango nebêjin em kurd  
in û qala kurdaiyê nekin. A, ez di vê  
nivîsa xwe de li wan nezanan qîr dikim û ji

wan re dibêjim: Hey gelî nezanan, qey  
wateya vê ayetê wekî we ye, ango ku kurd  
nebêjin em jî mirov in û nijad û gel in,  
hene? Na wateya wê ev e: Ku Xweda di  
Qûrana xwe ya pîroz de dibêje: “Misilman  
û bawermend hemû bira ne. Yanê, her kesî  
û civak û ji her nijadê re mafên taybetî û  
çandî û yên bi her awayî hene. Jixwe ew  
kesên ku birayê hev in di baweriyê de divê  
ku ew wekhev bin. Di hemû mafê mirovahî  
de. Lê bi rastî ez dikarim bibêjim ku, ev  
mela û şêx û nezanan kurdan, ewên ku her  
tim bi navê seydayê mezin Seîdê Kurdî, li  
hemberî doza gelê kurd derdiketin, ew ne  
bi serê xwe û bi zanîna bûn, ew hatibûn  
firotin. Ji aliyê hinek mêtîngerên ola îslamê  
ve. Hem jî hatibûne xapandin ji aliyê hinek  
hêz û rêxistinên navneteweyî ve. Ji bo ku  
zanyariya vî seydayê kurd ê mezin, ji hinek  
armancên xwe yên navneteweyî re bidin  
xebitandin. Hem jî bi alîkariya wan sazîyên  
li ser navê nûrcîyê.

Belê, ev e rastîya bûyerê, lê Seyda ne  
wek nîşandayîna wan gemaran e. Ew  
gelperwer e, welatparêz e û rind jî  
Xwedanas e. Dizane ku Xweda, Xwedayê  
her kesî û her nijadê ye. Hem jî mafê her  
kesî ye ku li ser rûyê vê cihanê dijî, ku bi


serbestî û serfirazî bijî û gelê kurd jî, yek ji  
wan e.

Emê çend mînakên ji bo xwendevanên  
xwe, ji gotinên Seydayê mezin û heja bînin  
ziman. Wan gotinan jî em ji ber xwe  
nabêjin. Em wan gotinên pir birûmet û bala  
ji pirtûka Seydayê mezin, ew a bi navê  
“Aşarê Bediye” derînin holê; ji bo ku her  
kes bizanibe ku Seyda xwenas û olnas e.  
Ewên ku hetanî îro xwe firotibûn, bi hinek  
berjewendiyên kesianî û nemirovahî Seyda  
ji gelê bindest re bi dijîtiya gelperweriyê  
dabûne nîşan.

Seîdê Kurdî dibêje: “Hey gelî kurdan,  
min tîmarxane qebûl kir, fermana padîşah û  
meaşê wî û îhsana wî ya pir mezin qebûl  
nekir. Her ji bo ku ez kurdayetiya xwe  
lekedar nekim.” Û wiha jî dom dîke: “Eger  
ev wekî doza bi tenêti, îxtilaf, xwefirotin,  
meyla axatiyê, doza ji xwe re xebitandina  
gel, xwexapandin, xapandina hinekan û  
doza ji xwestinên kurdayetiya sînî bê  
nîşandayîna hûn şahid bin ku ez ji wê kur-  
dayetiye îstifa xwe didim. Û bi kurdayetiya  
tebîî, ew a ku mîranî û rastî û ku xwestina  
olî ye jî, ez bi wê îftixar (şanzî) dikim.  
Çawa jî ku ji bo vê kurdayetiya han a tebîî  
ez ketime tîmarxaneyê.”

# Fîlozof û welatparêzê mezin, katibê Şêx Seîd: Fehmî Bîlal

A. MELİK FIRAT



**Şexsen feyda min, gelek ji Fehmî Bîlal çêbû. Me wê çaxê di medreseyê de ilmê erebî xwendibû. Di felsefeya îslamê de, di mantiqê de, di felekiyatê de (astronomî), di fizîkê de, di ilmê tefsîr û kelmê de ez pêşketî bûm, lê min edebiyat û ilmê Rojavayê (xerb) nexwendibûn. Wî ji min re got, hinek jî klasîkên Rojava, yên ûris û fransîzan, yên îngilîzan û almanan, yên latînî û yên grekan bixwîne.**

**D**ema Mustafa Kemal ji bo guherandina paşnavan qanûn derxist, memûrê wan dihatin, paşnavê wekî kevir, dar, çem, kanî li mirovan datanîn ku qet eleqeya wan bi mirov, bi malbata mirov tune bû. Di vir de jî, dîsa stratejiyêke kemalîstan a veşartî hebû; dixwestin civakê tevlihev bikin ku kes nizanibe ew çi ye, koka wî rûm e, ermen e, arnawûd e, çi ye?.. Bila kes nizanibe, millet hev nas neke... îcar bi malbata me re, paşnavê katibê Şêx Seîd, Fehmî Bîlal jî, "Fîrat" danîn.

Fehmî Bîlal mirovekî xwende û zane bû, endamê Teşkilata Azadiyê bû. Wexta ku Şêx Seîd ji bo haziriya biharê li wê herêmê digere, ew jî tê ba Şêx Seîd, dibe katibê wî û nivîsandina teblihatên wî, ew digire ser xwe.

Wê çaxê li Kurdistanê mekteb kêm bûn, ji ber vê jî xwendekar gelek kêm bûn. Lê Fehmî wê çaxê mekteba îdadî,

ku di sewiyeya lîseyê ve gavê de ye, xwendibû. Însanekî gelek zana bû. Zimanê frensî û tirkî gelekî baş dizanibû. Çîrokên La Fontaine ji frensiyê wergerandibû zimanê kurdî. Li ser bûyerên (hedîse) tarîxî jî gelek nivîs û çîrok nivîsandibûn.

Nivîsên ku li cem xwe hiştibûn jî û yên ku danibûn cem me jî, tev çûn... Wexta ku em sirgûn dikirin, vê dewleta zalim ji aliyê çapemeniyê ve jî çiyê me hebû dibirin, dişewitandin... Yê min bi xwe jî, ew wesîqeyên ku min top kiribûn, du car hatin birin şewitandin...

Werhasil, ew eserên (berhem) Fehmî yên heyf, ne li cem wî man, ne jî li cem me...

## Ew û Celadet dibezine hev

Piştî ku Serhildana Şêx Seîd Efen-

dî şikest, Fehmî jî derbasî Iraqê bû. Apê min Şêx Elî Riza Efendî wê demê li Îranê ye, ew jî ji wir derbasî Iraqê dibê. Fehmî diçe Bexdayê li ba Şêx Elî Riza dimîne. Piştî çend salan ku li Bêrûdê kongreya Xoybûnê çêdibe; Şêx Elî Riza ji bo beşdariya kongreyê Fehmî û apê xwe Şêx Mehdî dişîne Bêrûdê. Di kongreyê de ew û Celadet Elî Bedirxan munaqêşe dikin, heta dibezine hev... Û li ser vê, vedigerin tèn...

Li Iraqê dema Fehmî Bîlal, Şêx Elî Riza, Şêx Mehdî, Emîn Birûsko, Şêx Selehedîn û Îhsan Nûrî Paşa bi hev re diman (ji bo Serhildana Agiriyê, jixwe Şêx Elî Riza Efendî Îhsan Nûrî Paşa dişîne. Îhsan Nûrî Paşa û zabitekî hevalê xwe diçin. Di rê de lingê (piyê) hevalê wî dişewite, xwe nagihîne Agiriyê, lê Îhsan Nûrî Paşa xwe gihandibû hedîseyê).

Şêx Elî Riza Efendî her meh wekî meaş hinek pere dide wan. Em bibêjin

ku serê mirov sê zêr bida, ji xwe re jî digirt sê zêr... Di nivê mehê de Fehmî û Emîn Birûsko diçûn, wînda dibûn...

Ku pereyê wan xelas dibû, vedigeriyan. Îcar Şêx Elî Riza Efendî dema dipirse: "Fehmî tu çima diherî, tu diçî ku?" Fehmî jî "Ez çi bikim; ez tehemûl nakim, ançax diherim bi craqê teselî dibim..." dibêje. Û Şêx Elî Riza Efendî her car derdixe careke din, ji para xwe pere didiyê...

## Ateîst bû

Fehmî mirovekî mutefikîr bû, filozof bû... Ateîst bû, baweriya wî bi Xwedê tune bû, lê mîna mirovekî ku bi Xwedê bawer dike; wer jî Şêx Seîd Efendî hez dikir, jê re siyanet û hurmeteke mezin nîşan dida.

Piştî ku ji Iraqê vejeriyan, hatin; malbata me sirgûnî Trakyayê, ya Fehmî jî sirgûnî bajarê Ispartayê navçeya Axlasûnê kirin.

Di sala 1947'an de ku "Mecburi İskan Kanunu" rakirin, em vejeriyan, hatin Xinûsê. Fehmî jî vejeriya, lê neçû Diyarbekirê, çû li Darahênê (Genç) bi cih bû.

Sebebê çûna wî ya Darahênê, bi tabîra vê gavê nostalji bû; çimkî di hedîseyê Şêx Seîd Efendî de, ji bo naven-da (merkez) hikûmetê Darahênê hatibû qebûlkin...



**Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd hin serok û rewşenbîrên kurd ji neçarî derbasî Sûriyeyê bûn. Di wêne de hin ji wan kesan tene dîtin. Yê rûniştî; kurê Şêx Seîd, Şêx Elî Riza, yên ji piyan (ji milê çepê ve); Zabit Hurşîd Efendî, Fehmî Bîlalê Licî, Tevfik Efendî û Serokê Serhildana Agiriyê General Îhsan Nûrî Paşa.**



Ji Xoybûnê

**• 20. 5.1929 Serhildana Zîlanê**

Eşîrên kurd wekî li Wanê eşîrên Zîlan û Celalî, li Sêrtê Bekiran, li Mûşê Heyderan û Banûkivan, li Bilisê Ademan, bi civandina 1500 kesên şervan dest bi serhildaneke nû kirin. Roja 20'ê gulanê di bin serokatiya Seyîd Abdulvahap de û birayê wî Seyîd Resûl, Abdurahman Paşa (ew ermen e), Emîn Paşa, Kor Husên Paşa serhildan, bi êrîşkirina ser hêzên tirkan dane dest pê kirin.

Li hêla din li Erdîşê di bin serokatiya Dewrêş Axa de êrîşkê li ser qereqoleke Erdîşê çebûbû. Di vê êrîşkê de 2 serleşker û 16 leşker hatibûn kuştin. Li ser vê bûyerê ji Artêşa Tirk Alaya 28 û 29 û Alaya Siwariyan

ya 11'an li herêma bi operasyoneke berfireh qetlîfama Zîlanê pêk anîn.


**• 20.5.1930 Hereketa Stewrê**

Di destpêka sala 1930'yan de bi beşdariya waliyên bajarên Kurdistanê û Mufetîşê Herêmê Ibrahîm Tealî civînek tê çêkirin. Mebesta wê civîna rê li ber serhildanên kurdan girtin, çekên di destê gel de berhevkirin bû. Li ser wê biryarê artêşa tirk dest bi operasyonan kir. Gundiyên herêmê ji bo ku çekên xwe nedin, li hemberî vê biryarê derketin û li hemberî artêşê dest bi şer kirin. Çekên gundiyan jê digirin û kesên ku li hember derdikevin jî dikujin. Serhildana Stewrê û Qetlîfama Stewrê jî bi vî awayî dest pê kirine.

**AWIR**

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



### Pêwist e ku Axîna Welat û Azadiya Welat yek bin!

**W**ekî ku te zanîn, rojnâmeya Azadiya Welat li Stenbolê û Axîna Welat jî, li Moskovayê derdikeve. Her du jî xwerû bi kurdî ne. Azadiya Welat ji hefteyek û Axîna Welat jî, ji du hefteyan carekê derdikeve. Çawa armanca her du rojnâmeyan yek e, her wiha pirsgrîkê û astengên her du rojnâmeyan jî yek in. Wê demê çareserî çi ye? Li gorî dîtina min, çareserî pêkanîna armanca û çareserîkirina asteng û pirsgrîkên her du rojnâmeyan e. Ev çawa dibê?

Û her du rojnâmeyan me jî, ji aliyê nivîskar û nivîsar, aborî û belavkirinê ve, di tengasiyê de mezîn û dijar de ne. Dema mirov li rojnâmeyan dinêre, ji aliyê naverokê ve qels in. Ji aliyê nivîsaran ve diyar e û zehmetiyên dijar dikişînin. Kalîteya çapê jî li paş e. Raxistin û pergala nivîsar û rûpelan ne nûjen û balkêş in. Ev tişt bi taybetî ji bo Axîna Welat derbas dibê. Di kurdiya her du rojnâmeyan de gotinên çêkirî hene. Ziman mekanîk e. Ne zimanekî patî û rawan e. Bi taybetî Axîna Welat her çiqas ji Tirkiyeyê dûr derbibe jî, piraniya werger û nivîsaran bi mêjiyê tirkî tene formulekirin û nivîsandin. Mirov dibêje qey Stenbol û Moskovayê cih guhartine. Moskova çûye Stenbolê û Stenbol jî çûye Moskovayê. Wiha diyar e ku tirkî ketiyê mêjiyê kompîtura Bavê Nazê jî.

Belê her du rojnâme jî, ji aliyê aborî ve, li ku be di krîzê de ne. Nikarin xwe fînanse bikin. Ji bizava rizgarî re bar in. Sîstema belavkirinê bêserûber û bêplan e. Heta di rewşa wiha de ne, ku abone li aliyekî, rojnâme nagihîjin destê nivîsaran jî. Rojnâmeya ku di dema xwe de germegerm belav nebe û nekeve destê xwendevanan, ew rojnâme bi jana reş dikeve, kezêbreşî dibê. Dikare jî vî nexweşiyê bimire jî.

Baş e, madem ku bi rastî rewş wiha ye, wê demê çi pêwist e ku mirov bike?

Ez dibêjim û difikirim ku ew rojnâme û kovarên ku armanca û naverokê û zimanên wan yek in an jî nêzikî hev du ne, divê yek bibin. Xwe ji xebatên teng, herêma û amatorî rizgar bikin. Hemû îmkânên xwe yên madî, manewî û zanariyê bigihînin hev du û bikin yek. Naverokê xurt û kalîteyê jî nûjen û bilind bikin. Bi zimanekî zelal, patî û rawan pêşkêşî gel bikin. Çend rewşên bîr û nivîskar ne bi tenê ji bo xwe û derdora xwe binivîsin; bila ji bo gel binivîsin. Ji ber vî yekê, divê rojnâmeya Axîna Welat û Azadiya Welat bigihînine hev û ne du rojnâme, rojnâmeyekê derxin. Rojnâmeyekê hîn bi naverokeke xurt, bi zimanekî zelal û hêsan, bi kalîtetir û bi serûbertir... Li der û hundir baştir bê birêxistinîkirin û di dema xwe de bigihe her kurdî. Wê demê pirsgrîkê û krîza nivîsar, aborî û astengiyên ku li pêş belavkirinê hene jî, kêma dibin.

Di cihê de ye ku em giranî û girîngiyê bidin ser rojnâmeya Azadiya Welat. Wê xurtir û baştir bikin. Ya girîng Azadiya Welat nêzikî welat e. Di nav çav û mêjiyê dijmin de derdikeve. Ew dikare bi hêsanî xwe bigihîne piraniya nivîsaran, rewşên bîr û gelê kurd ê li der û hundir. Dîsa ew bi awayekî hêsan dikare li tevahiya welat, Tirkiye û li Ewropayê bê belavkirin. Berî her tiştî pêwist e ku ew wekî prensîbê divê bijî. Ya duyem; Azadiya Welat bi hemû kil û kêmasiyên xwe ve wekî dezgeh rûniştîye. Xebatkar û nivîskarên wê her ku diçe xwe ji aliyê zimên, pişê û rojnâmegeriyê ve bi pêş ve dibin û bi pêş dikevin. Karûbarê rojnâmegeriyê jî xwe re kirine wêk pişê. Di hejmarên dawiyê de, rojnâme ji aliyê naverok, form û pergala rûpelan ve baştir û xweştir dibê.

Di rojên îroyîn de rojnâmeyekê wiha anca dikare bersiva pêdiviyên bizava neteweyî bide. Dema rojnâmeyan klasîk û herêma li paş ma. Divê em hemû hêzên xwe yên madî û manewî bikin yek. Di warê çapemeniyê de jî bi awayekî nûjen bersiva demê bidin!

mî), di fizîkê de, di ilmê tefsîr û kelimê de ez pêşketî bûm, lê min edebiyat û ilmê Rojava (xerb) nexwendibû. Wî jî min re got, hinek jî klasîkên Rojava, yên ûrs û fransîzan, yên îngilîzan û almanan, yên latînî û yên grekan bixwîne. Ez bi wasîteya wî elimîn xwendin û hînbûna edebiyat û felsefeya Rojavayê.

### Çîrokên Mamê Hîto ji şewitandin

Zimanê kurdî baş dizanibû, zimanê tirkî û zimanê fransîzî jî baş dizanibû. Em hinekî li ser sekinîn; bi qederê 12 çîrok nivîsandin. Navê "Çîrokên Mamê Hîto" li çîrokên xwe kir. Ev çîrokên wî gişk hikayeyên edebî û tarîxî bûn, xweş bûn... ev çîrokên xwe û tercûmeyên xwe yên La Fontaine danibû ba me, lakin dema em hatin girtin, ew gişk hatin şewitandin....

Paşê dîsa vegeyriya çû Diyarbekirê. Li Diyarbekirê welatparêzekî bi navê Terzî Şemsî hebû, mirovekî baş bû. Wî jê re gelekî xizmet kir. Xwedê rehma xwe li herduyan jî bike.

Di paşiya emrê xwe de dest bi nîmêjê kir, êdî aliyê wî yê îslamî jî derkete pêş...

### Ez mutesîr im

Taybetiyekê wî hebû: 80 salî bû, kal bû, lê dema di radyoya Iraq û Rewanê (Êrîvan) de marşa kurdî lê dixist, yek caran radibû, li piyanî disekinî. Em jî radibûn, heya ku marş xelas nebûya rûnedinişt. Disiplîneke wî ya mûntazam hebû. Ku hinekan jê re digotin "Apê Fehmî tu ixtiyar î, çima radîbî?" wî jî wan re "Na, ev marşa me ya milî ye, gerek e ez jî piyanî guhdarî bikim..." digot.

Ez pîr mutesîr im ku me nekarî wan eserên wî biparêzin. Vê rejîma barbar û xwînwar tiştek jî me re nehişt. Di malbata me de, nivîs û wesîqeyên Şêx Elî Rîza û Şêx Selehedîn jî şewitandin. Heta mektûba Şêx Seîd ku beriya wî daliqînî, li bin dara sêpiyê nivîsandibûn jî girtin, şewitandin...

Halbûkî wan bixwe destûr dabûn, ku ew mektûb were nivîsandin û jî me re rê bikin, lê bi xwe jî hatin şewitandin.

Fehmî Bîlal mirovekî bi namûs, welatparêz; ji bo milê xwe, ji bo welatê xwe mirî bû....

Careke din xwedê rehma xwe lê bike.

Darahênê, navçeyeke gelekî xweş e, li kêleka Çemê Mûradê ye. Fehmî, li wê derê dawawekîlîtiyê dike, ji xelkê re arzuhalan dinivîsîne, pê îdarçya xwe dike...

Li wê derê du salan ma, lê dema diçe wê derê, dibîne ku millet dev ji doza xwe berdane, ji bîr kirine. Wê rejîma zalim, zoreke wisa daye ser xelkê ku insan ji xwe dûr ketine, dixwazin xwe, eslê xwe ji bîr bikin; di kesî de fikr û raman ne-maye. Bi kê re dipayive, kes guh nadê...

### Dikeve depresyonê

Li ser vî yekê aciz dibê, dikeve depresyoneke ruhî; ji xwe, ji heyata xwe bê-hêvî dibê... Rojekê diçe ber çem, dil dike ku xwe biavêje avê, dawî li jiyana xwe bîne, lê pişt re xwe navêje û sebebê vî jî, ji me re wiha digot:

"Bihara ewil bû, Çemê Mûradê bi li-melim diherikiya...

Min got, ezê xwe biavêjim nava vî avê ku ji Kurdistanê derdikeve û diçe, ezê di navê avê de nihayet bidime heyata xwe...

Lê, tam wexta min xwest ku ez xwe biavêjim avê, min dît ji nişkava Şêx Seîd li wî aliyê avê, li ser hespekî boz siwar e...

Destê xwe rakir û ji min re 'Fehmî tu çer diki!?' got. Ku min ev deng bihîst, min got gelo ez xeyal dibînim, ev çi ye?

Min berçavka xwe ji ber çavên xwe hilda û çavên xwe mist dan ku ev xeyal belav bibe, lê dema min careke din berçavka xwe da ber çavê xwe û xwest ku ez xwe biavêjim avê, dîsa Şêx Seîd li ser hespê boz deng li min kir:

"Fehmî tu çi diki!?"

Li ser vî yekê, ez gihame wê baweriyê ku Şêx Seîd bi vî xwesteka min qayil nîn e, naxwaze ku ez nihayet bidime heyata xwe.... Hê jî kar û xebatên ku ji bo welat û millet bikim, hene. Û ez hêdika jî devê çem vegeyriyam."

Ew bi xwe ateîst bû, ji Xwedê ne pîr bawer bû, lê ev mesele jî wî digot...

Wê demê em li kela Xînûsê diman. Dema em pê hesiyay, apê min jê re xeber şand, gotê ku tu li wê derê aciz bûyî, were Xînûsê ba me...

Hat, me jê re li navenda Xînûsê yazî-xaneyekê kirê kir. Gundê me ji Xînûsê du kilometre dûr bû; em her roj dihatin Xînûsê cem wî. Şexsen feyda min, gelekê çebû. Me wê çaxê di medresçyê de ilnê erebî xwendibû. Di felsefeya îslamê de, di mantiqê de, di felekiyatê de (astrono-

# Jinên kurd û yên tirk

## hevalbendên hev in

**B**irêz Ülger, hûn dikarin ji xwendeanên me re rabirdûya (paşeroj) xwe bînin zimên?

ÜLGER: Belê, bi dilşahî ezê bînim ziman. Gava ku derbeya leşkerî ya 12'yê rezberê qewimî ez wê demê 14-15 salî bûm û min li dibistana amadehiyê (lîse) dixwend. Wekî gelek hevriyên şoreşger ez jî ketim girtîgehê; salekê razam. Min di wê demê de şoreş çiyê, rastiya pêvajoya şoreşê çiyê, li Tirkîyeyê şoreş çiyê, nizanibû. Ez bi vî awayî di girtîgehê de razam û 40 rojî di binçav de mam. Îşkence di dema 12'yê rezberê çiyê bû, min jî dît; wekî gelek şoreşgeran.

Piştî ku ez ji girtîgehê derketim, demekê bi şûn de ez zewicim. Ev 12 sal e ez zewicandî me. Ez bi xwe tirk im û jî Meraşê me.

Min xebatên xwe yên şoreşgerî di

**Berî demekê, HADEP'ê pêvajoya kongreyan derbas kir. Di kongreyan de gelek mijar hatin nîqaşkirin.**

**Piştî kongreyan li gelek cihan kargerî hate guhartin; wekî Çiğli, Bergama û Karşiyakayê kargerî û serokatî kete destê jinan. Hevalê me FEREC KURÊŞIVAN, bi Seroka Navçeya Çiğliyê Rahime Ülgerê re li ser wê û bûyerên dawî ev hevpeyvîn pêk anî.**

nav çepa tirk de domandin. Hûn destûrê bidin, ez navê rêxistina ku min cih tê de digirt nabêjim.

Di sala 1992'an de em meşiyên Enqereyê bi navê 'Meşa Mirinê' (ölüm yürüyüşü). Ez bixwe sazûmankara wê meşê bûm. Meşa me 27 rojan domand. Di wê navê de jî, ez ji bo rêxistinîya jinan li İzmirê dixebitim. Potansiyeleke jinan hebû, me xwest em wê binirxînin. Me bi navê 'Ji Jinên Kedkar re Piştigirî'

ri' komeleyek vekiribû, sal û nîvekê vekirî ma û pişt re dewletê komeleya me girt.

Dû re me bi navê 'Bultena Jinên Kedkar' weşanek derxist û ez nûnera wê ya İzmirê bûm. Ev jî salekê derket û niha jî bi navekî din derdikeve. Min salekê nûnertî kir.

*Ji kerema xwe re hûn dikarin hebekî qala dorhêla xwe ya çepgir bikin, çi çax we dorhêla welatparêz nas kir?*

**Zarok bûbû 20 salî, me digot ku keçik e, an kurik e**

ÜLGER: Belê, lê pêşî ez dixwazim vê ji gelê xwe re diyar bikim. Ji bo ku ez ji wê dorhêlê veqetiyame ez zehf dilxweş im. Hêla min a ku ez xistibûm nava refa çepa kevneşopî (geleneksel sol) rehên xwe bi malbata min ve girê dide. Birayên min, bavê min hemû di nava çepa kevneşopî de cih digirtin. Ez jî di bin bandora wan de bûm. Pişt re ew çûn Ewrûpayê (Ezê niha qala jiyanê wan a Ewrûpayê jî bikim).

15 salan min di nava çepa tirk de xebat kir û ez bi keda xwe dişixulim. Heta sala 1992'yan me ev guftûgo dikir: Kurdistan mêtîngê e an ne mêtîngê e?

Yanê wekî ku zarokek çêbûbe, bûbe 20 salî, hîn jî em bibêjin ku, ew keçik e an lawik e. Ev guftûgo tişteki derî mantiqê ye. Pirsgirêka kurd ketiye pêvajoya çareseriyê, em hê jî li cihê xwe ne.

Bi riya Azadiya Welat ez karim hinarekê (mesaj) bidime malbata xwe û yên wekî wan?

**Bila şoreşgerên berê li keda xwe xwedî derkevin**

*Belê, kerem bike...*

ÜLGER: Ji malbata me, ez zaroka malê ya biçûk bûm. Ez bi bandora wan bi şoreş û şoreşgeriyê re hevnas bûm. Bi taybetî birayekî min hebû zehf bandorkar bû li hawirdora xwe; kesekî zana bû jî. Ev jî di 12'yê rezberê de 2 salan di girtîgehê de ma, birayê min ê din jî wekî wî. Gava ku hate berdan wekî gelek şoreşgeran derket Ewrûpayê.

Ez, mirovên ku çûne Ewrûpayê dikim du bir: Yek jê, gelek kesên şoreşger ketin feqa jiyana kapitalîzma Ewrûpayê û çanda xurifî pejirandin. Hêla wan a şoreşgerî qediya û li pey dirav (pere) û dewlemendiyê meşiyên. A duduyan jî, ev jinan nepejirandin û şoreş û şoreşgerî parastin.

Bi taybetî gelê kurd di wê xalê de pêşewa û serfiraz e. Bandora wan li rêxistinên çepên tirk jî bû. Û bi vî awayî gelek kesayetiyên şoreşgerî winda nebûn.

Malbata min di nav bira yekemîn de cih digire. Ez bangî wan dikim ku, bila werin li mîrata xwe ya şoreşgerî xwedî derkevin. Bila birayên min û hevalên wî rûmetê bidin nixê şoreşê, yên ku demekê jê re xizmet dikirin.



Seroka navçeya Çiğliya HADEP'ê Rahime Ülger

**Ez mirovên ku çûne Ewrûpayê dikim du bir: Yek jê, gelek kesên şoreşger ketin feqa jiyana kapitalîzma Ewrûpayê û çanda xurifî pejirandin. Hêla wan a şoreşgerî qediya û li pey dirav (pere) û dewlemendiyê meşiyên. A duduyan jî, ev jinan nepejirandin û şoreş û şoreşgerî parastin. Bi taybetî gelê kurd di wê xalê de pêşewa û serfiraz e.**





Seroka HADEP'a Karşiyakayê Zeynep Karadağ, jinikeke mêvan, Seroka Çiğliyê Rahime Ülger û Seroka Bergamayê Aysel Çiçek

*Hûn çava hevnasî dorhêla welatê zîya kurd bûn?*

**ÛLGER:** Li jorê min got. Me di nava xwe de guftûgoyekê bêwate dikir. Vê guftûgoya bêwate piştî demekê psikolojiya kesên durist xera kir, yê ku bi rastî jî, ji şoreşê û rizgariya kedkar û karkeran bawer dikir.

Êdî min dît ku rastî, ne li wir e. Eniya şoreşê vebûye. Em înternasyonalîzmê diparêzin, ew li ber çavê me ye, bes em nabînin. Min dîsa li pêşiyê gotibû ku ez bi berpirsî xebitîbûm di nav çepa kevneşopî de. Ez bawer im, ku bi rastî şixulîme, ji ber vê jî dilrihet im. Me li xwe jî gelek rexne digirtin, lê ew rexne nediketin pratîkê. Mîrov dikare bibêje sereke û girseyî bi hev ne bawer bûn. Pêşî zilamê min veqetîya, piştî wî, bi nêzikî salekê jî ez.

*Negotin ji bo ku zilamê wê veqetîya ye, ew jî vediqete?*

**ÛLGER:** Belê gotin, lê ev jî ji hêsanîya bîrbirina wan tê. Ger ji bo zilamê min bûya, di rojekê de emê veqetiyana. Ez jî salekê bi şûn de veqetiyam. Ez ji şoreşê bawer dikim, xelasiyê jî di vir de dibînim. Wekî gotinên ji bo zilamê xwe veqetiyaye" vireke mezin e.

*Em werin ser hevnasîya te û dorhêla waletparêz...*

**ÛLGER:** Di navbera salên 1993 û 1996 an de min di nava pêvajoya rêzaniya gelê kurd de cih girt. Di pêvajoya DEP'ê de min di sekreterî û kargeriya de peywir stand. Di vê qadê de gelemşeyên mezin min dîtî: Partî ye, lê yekîtiya tê de tune ye.

Banekên (xislet) kesên di nava partiyê de zehf mezin xuya dibûn. Di nava partiyê de berpêya (reaksiyon) min a

**E m îspat dikin ku mêr tenê nabin serok di nava partiyê de, jin jî di karin bibin serok. Rê ji hemû kesan re vekiriye. Bila jinên kurd, tenê xwe jin nehesibînin, wekî kesên rêzan bifikirin û bi vî awayî li HADEP'ê xwedî derkevin. Digel wê, em dixwazin xwenasîna çînî jî bidin jinên kurd.**

yekemîn ew bû: Min di vê qadê de têkoşîn da. Xebata me ya niha ji bo gihandina kadroyan e. Em di vî warî de baş diçin niha.

### Şoreş bi jinan serfiraz dibe

*Ji bo serokatiya navçeya Çiğliyê hûn di kongreyê de hatin hilbijartin û di kargeriya de tevî we 5 jin hene. Çima ewqas jin?*

**ÛLGER:** Jin nivê civakê ne. Şoreş jî bi saya jinan serfiraz dibe. Şoreşa Etopya û Nîkaragûayê mînakên baş in. Ji bo Kurdistanê û Tirkiyeyê pêwîst e potansiyela jinan bê birêxistin û di xebata min a şoreşgerî ya berê de jî mîna pêşewayakê, bi profesyonelî di nava jinan de ez dixebitîm. Rêxistiniya jinan ji karakterê min ê şoreşgerî tê, ev yek.

Ya din jî, ji bo dagirkeran jî di rîya

hûn jî jê bêhtir didin. Lê ev tenê ne bes e, pêwîst e ku mirov siyaseta jî baş bizanibe. Jinên kurd li gorî pîrbûna xwe, di hêla zanabûnê de hejmareke hindik in. Yanê kesên zana hindik in lê yê di navê de pir in.

*Di dawiyê de dixwazin çi bibêjin?*

**ÛLGER:** Em îspat dikin ku mêr tenê nabin di nava partiyê de, jin jî dikarin bibin serok. Rê ji hemû kesan re vekiriye. Bila jinên kurd, tenê xwe jin nehesibînin, wekî kesên rêzan bifikirin û bi vî awayî li HADEP'ê xwedî derkevin. Armanca me ew e ku em vî tiştî derxin ser qada siyaseta. Digel wê em dixwazin xwenasîna çînî jî bidin jinên kurd. Bi wan re hesta neteweyî heye, lê ya çînî qels e.

*Ji bo zimanê zikmakî çi hinarê (mesaj) dixwazin bidin gel?*

**ÛLGER:** Zimanê zikmakî ji bo şexsiyeta neteweyan krîterek e, pîvanek e. Jêderka wî jî dîsa jin e. Ji bo ku gelê kurd bibe neteweyekê xurt pêwîst e li zimanê kurdî xwedî derkeve. Bi taybetî jî ev peywir a jinên kurd e. Emê jî piştî gîrî û desteka xwe bidin wan.

Bi giranî divê gel li rojnemeyên bi kurdî xwedî derkeve, wê bi vî awayî zimanê standart li nava gel belav bibe.

*Li gorî we dîsa (sewiye) jinên kurd ya siyasî çi ye?*

**ÛLGER:** Jinên kurd û yê tirk hevalbendên hev ên şoreşê ne. Jinên kurd ji bo şoreşê, ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê pir niyet çak in. Ji bo şoreşê wan ji jinê tirk bêhtir qelen dane û

# Bila her kes li mafên xwe xwedî derkeve

**K**urd her dem bûne serêşa dewleta tirk. Ji roja ku dewleta tirk ava bûye heta îro, arîşeyên herî mezin ji ber înkarkirina kurdan derketine. Gelê kurd bi tenê nebûye maxdûrê van pirs-girêkan, hindikahiyên li Tirkiyeyê jî, ji mafên bingehîn ên jiyane bêpar mane.

Zagona Bingehîn a tirkan, di sala 1924'an de hatiye çêkirin û di sala 1926'an de jî li meclîsa tirk hatiye qebûlkirin. Wê, sê kan ji xwe re kirine bingeh: 1) Zagona Bingehîn a Dewleta Osmanî "Qanûna Dewletî Humayûn" ku ev zagon ji bo pirs-girêkên olî yê Dewleta Osmanî hatiye çêkirin. 2) Qanûna Cezayê ya Îtalyayê; di dema faşizma Îtalyayê de Wezîrê Dadê Roko Maazîn ji bo ku sistema faşist li piyan bimîne, çêkiriye. Madeyên 141, 142, 159, 125, 163, 159 ên Zagona Bingehîn ji vir hatine girtin. Bi wan xalan, mafê însanan ên fikirî, mafê meşê û hwd. hatine qedexekirin.

Her çiqas navê nijadperestiyê di nav tiştên ku hatine qedexekirin de derbas bibe jî, lê tiştê balkêş e, li Tirkiyeyê kesên ku nijadperestiya tirkîtiyê dikin ji wan re tu qedexe tune. 3) Qanûna Medenî ya Swêdê: Gelek qanûn jê hatine derxistin û orjînalîya wê nemaye.

## Mafên me

Li aliyê din qanûnên di hikmê qerarnamayan de, ku di meclîsê de têne çêkirin, hene. Ev qanûn jî ji Serhildana Qoçgiriye bigire heta şoreşa roja îro bi navên cur bi cur wekî "Tahrîr-î Sukûn", "Qanûna Koçberiyê", "Qanûna Herêma Taybet" û "Qanûna Têkoşîna bi Terorê re" derketine û bi wan mafên kurdan ên bingehîn hatine qedexekirin.

Her çiqas qedexe hebin jî li hemberî wan qanûnên ku hin mafan didine gel jî hene, wekî madeya 17'an a Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê: "Her kes li Tirkiyeyê xwediyê mafê jiyane ye, mafên her kesî jî aliyê madî, manevî ve bi vî qanûnê di bin selahiyeta dewletê de ne". Lê ev li Kurdistanê nayê bikaranîn. Yanê dewlet mafên mirovanên ku li Tirkiyeyê dijîn mecbûr e biparêze.

Di vir de tiştê tê hişê mirov, gelo kurdên ku hatine koçberkirin ne welatîyên Tirkiyeyê ne, ku dewlet li cihê ku mafên wan biparêze, mafên wan ên bingehîn li wan qedexe dike.

Dîsa madeya 19'an: "Her kes xwedî mafê jiyanê azad e." Madeya (CMUK) Qanûna Muhakemeyên Cezayê yê Usûlî, madeya 3842'an ku li Tirkiyeyê tê bikaranîn, li Kurdistanê bi awayekî dubare hatiye girankirin û li hemberî kurdan tê bikaranîn.

## Ew qanûnên ku ji dema Serhildana Qoçgiriye heta îro bi navên cur bi cur wekî "Tahrîr-î Sukûn", "Qanûna Koçberiyê", "Qanûna Herêma Taybet" û "Qanûna Têkoşîna bi Terorê re" derketine, mafên kurdan ên bingehîn pê hatine qedexekirin.

Li Tirkiyeyê, kesekî dikarin ancax 24 saetan di binçav de bigirin, li Kurdistanê ev jî 8 rojan dest pê dike, heta 3 mehan didome.

Dîsa li gorî vî qanûnê kesekî/ê ku bê girtin mafê wî/wê yê bédengiyê heye, heke der heqê kesê girtî de di destê dozger de ji bo girtina wî/wê delîl tune be nikare bigire. Dîsa mafê polîsan a lêpîrsîna kesên tune, ancax dozger dikare ji bo dozê şexsan hilde lêpîrsîne,

ji bo muaneyê. Lê ev çiqas bê bikaranîn jî hin doktor raporên ne rast dinivîsin, hin doktor carna ji ber ku têne tehdîtîkirin û hin ji wan jî hevkarên polîsan in. Dîsa polîs nikare mala we bê emrê dozger seh bike, ancax bi emrê dozger, dikare li mala we lêgerîne bike, li gorî madeya 97'an.

Dewleta Tirkiyeyê di qada navneteweyî de jî, ji bo mafên mirovan ên bingehîn û mafên jiyane peyman îmze kirine.

1980'an bi çêkirina qanûna 2932'yan bi zimanê kurdî axaftin, hatiye qedexekirin.

## Qedexeyên der barê mafên me de

Li gorî madeya Qanûna Nifûsê madeya 1587'an nav û paşnavên bi kurdî qedexe ne. Hejmar 2/1759, Qanûna Paşnavan madeya 5 û 7'an; kurd bi zimanê xwe nikarin ramanên xwe diyar bikin. Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê madeya 4'an "Tirkiye bi millet û welatê xwe ve neteweyek e, nayê dabeşkirin. Zimanê dewleta Tirkiyeyê tirkî ye, guherîna vî madeyê kes nikare teklîf bike." Bi Madeya 28'an jî dide zanîn ku bi tu awayî berhem, weşan bi zimanê kurdî nayên derxistin.

"Çapemenî azad e, nayê sansûrîkirin, weşandin û weşankarî ne qedexe ne. Lê bi zimanê qedexe weşankarîkirin qedexe ye." Ev made ji aliyê Turgut Özal ve di sala 1990'î de ji holê hate rakirin, lê di Qanûna Wezîfê û Selahiyetên Polîsan de hejmar 2559, madeya 8'an mafên dozger û polîsan heye ku berhemana berhev bike û dozê lê veke. Qanûna Têkoşîna bi Terorê re, madeya 8'an: "Li Tirkiyeyê tu kes nikare bibêje kurd hene û nijadeke cihê û hindikahî ne." Li Tirkiyeyê bi zimanê kurdî radyo, televîzyon nikarin weşanê bikin û kes nikare îstasyonên televîzyonê veke; hejmar 2954'an ya Qanûna Radyo û Televîzyonê, madeya 4'an; li Tirkiyeyê kurd nikarin ji bo pêşvebirina çanda xwe, hunera xwe komeleyan ava bikin û bi zimanê kurdî ders bidin, hejmar 2908 Qanûna Komeleyan, madeya 5'an. Dîsa li gorî Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê, madeya 77'an kesên kurd bi hêsanî nikarin di saziyên fermî de cih bigirin. Ev jî bi hin madeyên weşarî hatiye qedexekirin. Li gorî madeya 81'an jî kurd nikarin partiyeke ji bo kurdan ava bikin, mafên kurdan biparêzin û bi kurdî biaxivînin.

Dîsa dewleta tirk, di sala 1989'an de Peymana Parastina Mafên Zarokan qebûl kiriye, lê qedexe daniye ser madeya 7'an, madeya 29 /c-d û madeya 22'yan.

Wekî van qanûnan, pir qanûn hene ku li hemberî mafên bingehîn ên mirovane; ji bo qedexekirina mafên kurdan û hindikahiyên li Tirkiyeyê bi taybetî û li gorî nijadan hatine çêkirin.

Her kes di warê xwe de li hemberî van qanûnan têkoşîkê nede jî bi piranî kesên çepgir û kurd li hemberî van bêmafîyan têdikoşin. Tiştê jî heye ku divê em bi cidî li mafê xwe xwedî derkevin.

METİN AKSOY

**SAYCI, 25 KÜRTÇÜ SANİGA İDAM CEZASI VERİLMESİNİ İSTEDİ**

**Sanıklardan 24 ünün de delil kifayetsizliğinden ve delil yokluğu sebebiyle beraetleri talep edildi**



ANKARA, Döndürlü Mahkemelerinde...

YARINCI Mahkemelerinde...

BERAETİ İSTENEN...

Milliyet (18.9.1963)

lê li Kurdistanê polîs lêpîrsîne dike û piştî lêpîrsîna polîsan ku bersûc derdikeve dadgehê, mafê girtî heye ku di lêpîrsîne de ebûqat bixwaze, lê ew jî ji aliyê leşker an jî polîsan ve tê qedexekirin.

Jixwe ev qanûna 3842'yan û Qanûna Herêma Taybet xalên 30, 31'an li dijî Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê ne.

Heke polîsek nasnameyê ji we bipirse, mafê we heye ku hûn jî nasnameya polîs bipîrsin, li gorî Qanûna Cezayê ya Tirkiyeyê made 183'yan. Heke hûn bêne girtin, li gorî madeya 134'an mafê we yê bédengiyê heye, hûn dikarin îfade nedin polîsan û heta dawîya mehkemeyê jî mafê xwe yê bédengiyê bi kar bînin. Li gorî madeya 128'an hûn dikarin nasnameya xwe nîşanî polîsan nedin, ancax polîs dikare ji ber vî yekê we 24 saetan di binçav de bigire.

Li hêla din, heke di binçav de li we îşkence hatibe kirin, li gorî Qanûna Cezayê ya Tirkiyeyê madeya 243'yan, mafê we heye ji bo ku hûn herin doktor

rine. Li gorî Peymana Mafên Mirovan a Navneteweyî; madeya 2'yan: "Her kes ji bêyî cihêtiya reng, nijad, cinsiyet, ol, ziman, bi her awayî ramanên xwe yê siyasî çî raman dibe bila bibe.... dikare eşkere bike. Dewlet nikare wan mafên wan qedexe bike." Madeya 7'an: "Her kes li hemberî qanûnan wekî hev e...."

## Mafên Hindikahiyên

Peymana mafên dîrokî, mirovahî û siyasî ya Neteweyên Yekbûyî madeya 27'an: "Hindikahiyên olî, hindikahiyên zimanî, dewletên ku lê dijîn nikarin mafên wanê bi çand û hunera xwe jiyane, bi zimanê xwe perwerdehî dîtinê û li gorî ola xwe jiyane qedexe bikin."

Dewleta Tirk hem ev peyman qebûl kirine, hem jî mafên mirovahî yê bingehîn bi qanûnên ku bi xwe çêdike qedexe dike. Li gorî vî madeyê dewleta tirk ne mafên kurdan, mafên hindikahiyê jî nade û qanûnên wekî "Tahrîr-î Sukûn" derxistine û piştî 12'yê rezbera



**Li Navenda Çanda Mezopotamyayê vê heftiyê ev çalakî hene:**

- 19.5.1996 **Yekşem:** Konsera Koma Amed, saet: 14.00, Konsera Halil Karaduman, Resital ji kanûnê û sohbet, saet:18.00
- 21.5.1996 **Sêşem:** Koma Boğaziçi ya Hunerên Dîbariyê. Li ser "Şanoya Alternatîf" û Eugenio Barba", saet 18.00
- 22.5.1996 **Çarşem:** Semînera Faik Bulut, li ser Diplomasîya Kurdan, saet: 18.00
- 24.5.1996 **În:** Pêşandana Govendê. Koma Serhildan a Govendê, saet:14.00
- 25.5.1996 **Şemf:** Şanoya Jiyana Nû, Lîstîka Rojbaş, saet:14.00 konsera Koma Kizilirmak, saet: 17.00 heta 19.00
- Li BEKSAV'ê jî ev çalakî hene:**
- 19.5.1996 **Yekşem:** Bi şahidan Dêrsim, saet:17.00

**20 - 30 Gulan, pêşangeha karikatûr**

- 21.5.1996 **Sêşem:** Nihat Behram li ser şîr û sirgînê axaftin, saet: 19.00
- 24.5.1996 **În:** Semîner li ser Kapital II, Alaaddin Bilgi, saet: 18.00
- 25.5.1996 **Şemf:** Wêne û felsefe, Aydın Çubukçu, saet: 17.00
- Li NÇM'ya İzmirê jî ev çalakî hene:**
- 25.5.1996 **Şemf:** Şanoya Hêvî ji bo zarokan, saet: 14.00 Welat û Jivan nişandana dia û mîzansen, Koma Dîlanê ya NÇM'ya İzmirê
- Li Evrensel Kûltürê ev çalakî hene vê heftiyê.**
- 24.5.1996 **În:** Konsera Koma Şahmaran, saet:19.00
- Li MED-KOM'ê vê heftiyê:**
- 25.5.1996 **Şemf:** Semîner, "Di dirûka kurdan de guherînên aborî û rûberiyê", saet: 16.00

**RÛDAN**

# Leyla Qasim

## di dilê kurdan de wê her bijî

**Bedela daxwaza Leylayê ya pîroz,  
di temenekî ciwan de bi sêpiyê ve daleqandin bû.  
Leyla di 21 saliya xwe de, di 13'ê Gulana 1974'an de  
ji aliyê rejîma Baas a Iraqê ve, yanê faşîstên Bexdayê ve  
hate dardekirin.**

**M**a ew çi hêz bû ku li hemberî koledariya hezar salan serî hildida? Ma ew çi daxwaz û hêvî bû ku, mirin jî xistibû bin piyan û ji bo azadiya gelê xwe yê ku bi hezaran sal ji aliyê xwînmijan ve xwîna wî dihat mêtin, serê xwe hildida û têdikoşî? Gelo nizanibû ku bi tenê serê xwe nikare vê "qedera" gelê xwe biguherîne? Lê her hal bawerîya xwe bi gelê xwe dianî ku wê rojek were, gelê wê, wê rabe ser piyan û "qedera" xwe jî biguherîne.

Leyla Qasim berî bîst û du salî dema xebatên xwe yê polîtîk li başûrê Kurdistanê dimeşand, kefenê xwe jî bi xwe re digerand. Çunkî di nav wan kesên ku tehemûla wan ne ji kurdan û ne jî ji azadbûyîna wan re hebû de, xebatên xwe dikir û wisa bawer dikir ku "ji serxwebûn û azadiya gelên bindest birûmetir tiştek nîn e".

Ma tenê li hemberî dijminên kurdan serî hildabû? Na! Her wiha li hemberî urf û toreyan jî serî rakiribû û bi jinbûna xwe dixwest ku parekê wê jî di nav têkoşîna azadiya neteweya xwe û têkoşîna jinên kurd de hebe.

Bedela daxwaza wê ya pîroz, di temenekî ciwan de bi sêpiyê ve daleqandin bû. Leyla di 21 saliya xwe de, di 13'ê Gulana 1974'an de ji aliyê rejîma Baas a Iraqê ve, yanê faşîstên Bexdayê ve hate dardekirin.

Leyla Qasim di wê demê de hem li Zanîngeha Bexdayê beşa sosyolojiyê dixwend, hem jî bûbû endamê Yekîtiya Xwendekarên Kurd û tevî hevalên xwe ji bo gelê xwe bi aktif dixebitî. Heta ku şevêkê bi pênc hevalên xwe ve ji aliyê polîsan ve hate girtin, xebatên xwe domandibûn. Di

binçav de gelek îşkence û tahde li wê tê kirin, lê Leyla serî natewîne li hemberî xwînmijan û li ber xwe dide. Pişt re jî Leyla û pênc hevalên wê di 13'ê Gulana de tîn dardekirin.

Leyla bi helwesta xwe bû semboleke serhildana jina kurd a li dijî zilm û dagirkeriyê. Bi wî rengî di dilê kurdan de cihê xwe girt û hêviya azadiyê jî geş dika.


Îro Leylayên kurdan baş dizanin, dema ku serî hildin, dibe ku mirin bibe para wan, lê dîsa jî her diçe Leyla zêdetir dibin; li Amedê dibe Zekiye, li İzmirê Rehşan, li Nisêbînê Besê, li Almanyayê Bêriyan û Ronahî û li serê çiyayê jî dibe Hêvî, Zelal, Hêlin, Sakîne û Rozerîn.

AYNUR BOZKURT



## TÎŞK

LERZAN JANDÎL



## Zarava kirmancî ser ro tenê pirtûkî 1

**S**e ke êno zanayene, zarava kirmancî ser ro gelê karî, wekintên amê kerdene. La belê ewê ke her kesî ra ver dest eyšto nê karî, yanê wayîrê nê kar û wekintenan zafêrî xerîb biyê. Ma wazenîmê nê mordemekan û karanê dînan, yanê pirtûkanê dînan wendekaranê xo rê bidîme şînasayene.

Mordemo ke na derheq de ma her kesî ra ve qalê ci kenîme Peter J. A. Lerch o.<sup>2</sup> Peter J. A. Lerch 1852 de nivîsêde Kunikî waneno û nayê ser ra înterese musneno zonê kirmancan. Şerê Kirmî de, Peter J. A. Lerch 23.12.1855 de kirmancanê ke hêsîr kewtê ser ro jû nivîs nivîsneno û 07.03. 1856 de şono Roslawl. Na suke girêdayê Smolensk ya. Peter J. A. Lerch naca hêsîranê Şerê Kirmî vîneno û nînan de qese kenê. Peter J. A. Lerch aşma 12.1855 de dest keno ci, letê pirtûkê xo yê 1. nivîsneno. Lerch letê 1. yê nê pirtûkî ebi vernîsê 16.08.1857 St. Petersburg, çap keno.

Letê 1 yîne de nê çiyê cêrênî estê:

- 1- Qesê Kurmanckî/kirdasî û Qesê Kirmancî (o vano Zaza) nivîsnê.
- 2- Tekstê Kurmanckî
- 3- Tekstê Kirmancî (zaza) rûpele 49 ra hetanî 87 û tede 7 şanikî estê.
- 4- Nivîsê orîjînalên ke A. D von Shaba (Jaba) konsolonsê Erzerumî û Nicol von Chanykow General konsolonsê Tebrîzî rûşnê, amê çapkerdene. Wunciya Lerch letê pirtûkê xo yê 2. jî ebi vernîsê 18.03.1858 St. Petersburg, çap keno.

Letê 2 dîne de nê çiyê cêrênî estê:

- 1- Cîkewten û têverşanîtena karanê zanayanê binan. rûp. 1 ra hetanî 80
  - 2- Ferhengêde Kurmanckî. rûp. 81 - 165
  - 3- Tercûmê tekstanê Kurmanckî ebi herfanê erebî. rûp. 166 - 188
  - 4- Qesê Hedrusî yê ke Kurmanckî û Kirmancî ra ciya rê. rûp. 189 -190
  - 5- Ferhengêde Kirmancî (Lerch wunciya vano Zaza) rûp. 191 - 214
  - 6- Rayşkerdena çewt û şaş nivîsiyene. rûp. 215 - 225
- Bê guman karo ke Peter J. A. Lerchî kerdo, ardo roştî, karêde bi qedr û qîmet o. Çi ke karo tewr verên o. Nayê rê vatena kesî nêbeno.
- La belê ha vaten û ha famkerdene de bê guman gumra çewtiyî amê kerdene. Sebebê nê kemasî û çewtiyan bê guman estê. Mordemekî sarê xo ra nêvetê. Hama, ma ewro zanîme ke zaf çî jî zê ke Lerchî nivîsnê niyê.

Peter J. A. Lerch ebi metodê transkripsiyonî 15 herfê vengî (vocal) nivîsnê. Nînan ra 9 hebî kilmê, 6 hebî jî derg ê. Wunciya nê mordemekî 27+2 herfê bê vengî nivîsnê. Se ke ma ewro zanîme, nê herfê vengî 15 niyê, 8 ê, herfê bêveng jî 29 niyê 23 wê.

Sebata ke tekstî derg ê û gramerî ser ro zêde kar niyamo kerdene, ma nêwazenîme zerrê nê pirtûkî ser ro zaf nêvindîme.

La belê nê pirtûkî ebi çewtiya xo, ebi şaşî yan jî kêmasiya xo, ganî bikuyo destê her kesî yo ke zon ser ro xebetîno.

1 Nayê ra tepiya nê kuncik de pirtûkê ke zarava kirmancî ser ro amê nivîsnayene, dame şînasayene.

2 Forschungen liber die kurden und die iranischen Nordehâler. Neudruck der 1979 der Ausgabe St. Petersburg 1857 - 1858, APA - PHILOPRESS AMSTERDAM

# Rezê Bawerde

**M**erdim Licey ra ber bi Pa-sûr (Qulp) wexto şino dewanê Sernis, Şexan, Mela, (dewê Hikmet Çe-  
fîn) Tûtya û Pirpag bivêro hema nêrise-  
no çemê Sarûme reyêko xam li milê çe-  
pî ageyreno. Ê reyî ra qederê 3 km.  
avarde, merdim riseno serê Çemê He-  
meke. Xura Çemê Hemeke û Çemê Ri-  
zî qederêk acêr risenê pê û benê Çemê  
Sarûme. (Çemê Sarûme sînorê Licey û  
pasurî yo.)

Merdim Pirê Hemeke ra bivêro eye  
ber bi rocawan feteliyeno û ver û verê  
Çemê Hemeke qiyame şino. Dorûverê  
çemî de tamam bexçey estê. Dorê bex-  
çan bi diriko awî, xibik û bi telî sênc  
kerdey. Miyanê baxçen de darê sewlan,  
hewran, valêrî û çîneyerî eyse nê. Da-  
ranê fêkî, razî gozêrî, seyerî, xewxêrî,  
încasêrî, zerdelî, mişmişêrî, hinarî, en-  
cîlî, tûwerî û zêdera maeşelê engure  
kunê verê çimanê yewî. Hema vacêne  
dar û ber ra çem nêye, seno.

Qasê 3 km. merdim pir ra qiyame şo  
riseno raştê Bawerde. Wucade reye be-  
no du cey. Deyê milê raştî şino Pêçar,  
Rîz, Ziktê, Maştâg û Gozêrik. (dewê  
Xetîp Dicle). Reyê milê çepî zî şino  
Bawerde, Dalane, Hesig, Barave, Hen-  
dîv, Mizage. Mizage ra wet Mehmedêl,  
Merge, Hemzê û Karincag est ê. Hen-  
dîv ra carzî Heşedere, Mezra û Tayzî-  
gumey estê. Wucara cor hendî koy be-  
nê asê, azgilêr ra wet hendî kuno kena-  
rê Darêyenî.

## Mintiqewko enê dewî hêy tede kino pê koy Licey

Koyo ku Licey paştê xo şawa ci xu  
ra çemê Birqlînî ra gino ta çemê Sarû-  
me de qedêno. Dergbûnî enê koy tex-  
mînen 35–40 km. est o. Di enê koy de  
en cay berzî cêk tam pê Licey de (bakur  
de) tera vanê "Diyarê Cûmî." Cêk zî pê  
dewê Qurmike de koyê Xalozuwanî û  
êra wet zî koyê Ziyare (Ziyarê Sibe Li  
Xêrî) est o. Enê koyan de yeniyê awa  
serdinezî zehfê. Xalozuwan de yenî yê  
Herpo û pê Mela da yeniyê Şancewze  
bi namewû vengê.

Enê koyzî zey tamamê koyanê Kur-  
distanî bi dar û daristanê û bi eşînayî  
xemelnayeyê. Zehfê daran, mazêr, şeb-  
loyer, hewrs, asindar çyb. Fêkiye ye-  
wanî zî zêdera est ê. Zey; Sinzêrî şeqo-  
qî, miroyerî, bihîvî, qicikbihîvî, mevro-  
kî, encîlî, zerdelikî, dirikî, seyerî û çyb.

Neysel ma hewna bin raştê Bawerde.  
Raştê Bawerde texmînen 30–40 km<sup>2</sup>  
est o. Bi awê vaye yeno awdayiş, yanê  
awî yo.

Di vererocê raştî de, verpalêko derg-  
dezî Rezê Bawerde estê. Engurê enê re-  
zan zehf şîrîn a. Engura emû zî, a siya  
û a balicanî bi name û vengê. Dorê re-  
zan bi daranê miroyerî, bihiyan, malot-  
tan, hecîhemzoyan û bi ên cîlan xemel-

nayeyê.

Şarê Bawerde di raştê de titûn, bacî-  
kî, balicanî, firingî, fesûliya, xiyaran,  
bamiya, kûyan û çyb. ramenê. Ê dewê  
ku ma cor namê îne mardî xora pêro  
awî yê. Di hergo dewe de raştêy zêy  
raştêy raştê Bawerde est ê û ê dewicê  
binî zî enê cûrey fêkiyan ramenê.

Wextê zelzelê Licey (1975) zehfê  
enê dewan şiyey bîra.

O wext ji bo ku enê dawan rê bere-  
qey biyê viraştîş îne rê reyê wesaitan  
viraziya bi. Reyê ku xam û nêqûm ker-  
dewo. Qirêderan bi kardî viraştî. Di  
deran de menfe zî çînyê. Zimistanan  
zehf beno çamor û şiyayîşê wesaitan  
gelêk zehmet beno.

Aşmê hezîranî de fêkiyê enê dewa  
vecêna. Verûcû xiyarî vecyênê. Badû-  
cû çiyê binî. 5,6 hey otobusê nîmey  
(yarım otobüs) û mînbûsî enê reyî sero  
xebetiyeyne. Serê amnanî ra bigêrê ta  
payizo peyin wesaitan sebze enê dewan  
antêna halê Sûkî.

## Rîz, Bawerde, Barave, Hendîv û Mizage de aryê awezî bibî

Merdim wexto veciyo diyarê koyê  
Ziyare yan zî Xalozuwanî enê dewî pê-  
ro têdir eyse nê. Dûrî ra merdim biani-  
yo kiya nêvînenê. Sîrf kutlê daran û  
êşînayî (keskî) eyse nê. Xora kiyey mi-  
yanê dara û eşînayî de benê vinî.

Enê dewan zî zey tamamê dewanê  
Kurdistanî zêdera sewalanê bizine ker-  
dêne wey. Sere duyes aşmî çirey kiyan  
ra mast, do, rûno teze, tantûr nêqedî-  
yeyne. Payîze hergo kiya çar panc hey  
bizî serebirneyne qey qewirmî ji boy  
zimistanî.

Heywanê xoyo zêdê zî payîze ber-  
dêne Licey de rotêne. Carna zî tucran  
ameyne dawan ra deyne arê û erê ney-  
ne.

Zimistanî vore zêde ra varena. Hey-  
wan hendî axuran de beno wey. Werê  
heywanî zehfê yê velgê darê mazêrî,  
vaşê arbûde (kete), nefele, lûz, sole û  
simer o. Cînî axuran ronê sil û pişkî ke-  
nê selan, Mêrdey zî zelanê silî li heran  
barkenê û benê miyanê hêgan de serê  
vore de kenê veng.

Zimistana zehfê rocane mirdey şîne  
seydê zeranca. Seydvanê zanayey zî  
yewana kozik virazenê, lext rişnenê û  
zêde ra zerencan gêne.

Kê min rewna ra Amede dew, la be-  
lê min çendî keysê xu dîne, ez şîne de-  
wanê Licey kê merdîmanê xo. Zêdera  
ez şîne Barave kê xalanê xu. Barave  
dewêka pila û zehf zî weş a. Panc meh-  
lê aye estê; Berxîg, Sinzêre, Sizêrin,  
Qûm û Axtîgan. Du çemî miyane dewe  
de riseypê. Yew tera Çemê Hendîvî  
û yew zî hetê merge ra yeno te ra vanê  
Çemê Qulboxî.

Zimistanan wexto ez şîne dewe, he-  
ma vacê zehfê dewican kiye ku ez te-

debinle ameyne wica û ma ta nîmê kê  
şewe qûnax (sohbet) kerdêne. Bi raştî  
zî merdim dîwane îne ra mird nêbîne.  
Zehf bi yarî û henekîni bî. Meselikî,  
vîstaniyî û kelamî ameyne vatiş. Carna  
zî dewican zemê yewbînan kerdêne.  
Xora werê bastêx, meşlûl û gozan di  
ser de weş bî.

Bastêx û meşlûlî engurera viraziye-  
nê. Rezê tamamê enê dewa zî hê di  
Raştê Bawerde de. Viraştîşê mewana di  
aşmê adarî dew o. Adarde roca ku we-  
şî bo, mêrdê enê dewan dariyane xo  
(dasên xwe) seqênênê û şîne miyanê  
rezan. Hem mewana virazenê û hem zî  
bi vengo berz qîrenê halê yewbînan  
persenê, diwan kenê, carna zî qermikan  
erzenê yewbînan.

Wexto benê rincan zî duyew hîre-  
yew yenê tibar û qutiyanê xoyê cixaran  
danê yew bînan îkram kenê.

Di aşmê avrêlî de wextê kendîşê re-  
zan o. O wext hewna dewicî pêro me-  
ranê xo gêne yenê rezan kenênê. Sêncê  
îne newe kenê. Di aşmê avrêlî û gulanî  
de yê dora çîqas weş o, herca beno êşîn.  
Pivokî, kolbizêkî, sosinî, nergizî vec-  
yenê.

Her cara boy vaşî yena. Gulê cinne-  
tî boy xo veradanê kezêbê merdimî.  
Gilhê tîrşî vecênê. Qeflê cîniyan û key-  
nan yewan ra xerdel, tûzîk, nançûçik,  
kîngîran û pincaranê bînan danê arê.  
Keyney têdir kelaman û strananê zerî  
vanê. Erzenê xo û xortanser, tûtîzî şîne  
verê bizeka û verekan.

Şiyayîşê wextê serê rezan, di aşmê  
payîzî a miyanîne de swo. Hema panci-  
yes-vîst roc maneno şiyayîse serê re-  
zanrê, dewicî haziriyê xo kenê. Maese-  
ran cis kenê, kuçikan virazenê qey girê-  
nayîşê şîrî û dimsî. Xincîkan newe ke-  
nê. Kolya (êzim) anê qey adirî. Qerqe-  
lêk, heycanêk kuno miyanê dewan.  
Caw erênenê qey çarşewanê bastêxî.  
Kankilê gozan kenê la wa qey meşlûla,  
firaqan heder nenê.

## Sela virzenê

Enê dewî pêro xewere şîrawenê  
yewbînan rê û di yew roj de şîne serê  
rezan. De yo roc çî roc o. Qey yeno va-  
tişî... Qey yeno nûstiyî. Çirey vînayîş û  
vatiş beno yew. Kalan û pîranê extiya-  
ran û cîniyê wayîrê tûtanê şîfî kiyan de  
manênê. Bi mêrdan, cîniyan, keynan,  
xortan û bi tûtan şevqê serê suwey  
rew wirzenê. Li heran û qantiran lî, be-  
roşan, niqre, selekan û firaqanê bîna  
barkenê û verê xo şanê miyanê rezanê  
Bawerde. De rezê Bawerde zî bibarîkî  
ne sere wo ne bin o.

De keyney cilanê xoyê newa danê  
xoya, bîskanê xo tadanê.

-Xortî riyê xo virazenê çalwanê  
xoyê newa danê xora poçax virazene û  
xora bûkî zî tewirêna weş xo virazenê.  
Ha şiyayîşê serê rezan, ha veywe. De  
belkî însanê vîst dewan zêde di Rezanê

Bawerd de risanê pê. Tivanê eynû mîh-  
rican o (festival). Pancyesêk zêde rezî  
nêqedênê. Xora keyney û lacî ji bo ku  
serê rezan leze nêqediyê hêdî qebetênê  
û zexelî kenê.

Şanvana çîqas weş govendê gêrêyê  
dewan est ê di raştêkê miyanê rezan de  
riseyê pê û ta tariyê şewe govendê gi-  
rotêne. Hetêk de zî keynan. Çendî stra-  
nê govendê bibî ewca ameyne vatiş û  
werêkerdiş.

Keynan û xortan zerî girotêne. Çen-  
dî meseley zerî bibî kokê îne miyanê  
rezanê Bawerde de dest bî ci kerdê. De-  
wican bi zî sere birneyne û serê adirî de  
goşt sur kerdêne. Wexto boy goştî kew-  
têne o welat, de merdey gor ra wirîştê-  
ne. De goştê surkerdewo şor û engura  
şêrîne çendî têdir weşa. Ax.. ax..

Ax ku çî ax! De eyro hela şêrê yo  
welat we; o, rengîn bi vîne. Ê rezanê  
Bawerde bivîne. Go hezar merdim  
sond bi wano vaco; etya rez çînebîyo.  
La bexçey ka...! La yê dewî?

Di binê rezanê Bawerde de di çetelê  
wurdî reyan de yew qereqole amî viraş-  
tişî (1988). Verûcû tede da pancas es-  
ker bibî. Eyro qalê pancsey hew yeno  
kerdiş.

Verûcû Pêçar veyşna. Pêçar disey  
kiye zed bî, dewê mîrana û zehf zî de-  
weka kana. Wextê çînayîşê vaşabî. Şa-  
rê Pêçarî pêro miyanê mergan de vaş  
çîneyne. Warwey û bi cilanê karî bi zor  
ganê xo xelesney. Eyro di xirbanê ba-  
nanê Pêçarî de şîne dîkan de kundê ko-  
rî veydenê. Ya Rîz, Hesîg, Hendîv, Mi-  
zage, Bawerde, Gozêkîk, Maştâg heş-  
dere, Hemezê, Mehmedêl, Merge, Xo-  
dîge, Çûm, Barave-Qey yenê mardîşî.  
Temamê enê dewan veyşney û dey ve-  
rê gulanê topan. Wey zaliman rezî  
veyşney. Bexçey dar û ber. Rasitanî.  
Koy.

Eyro merdim şo welat di bine rezanê  
Bawerde de di çetelê wurdî reyan de di  
serê pozêk de ya menşûr qereqole zêy  
kê zebaniyan ha vindertî. (Üçdamlar  
Karakolu) Dorê-aye tamam dês o kere-  
yîn o. Di hewşê aye de tankê almanî  
hêy vinderte. Vertopan zî taykine şawo  
mizaglû, taykine şawo koy pê xodîge,  
taykine şawo koy Pêçarî. Ê reye, rey bi  
korankî gulanê topan erzenê enê cayan.

Heywanê dewican êkû bê wayîr  
mendî bî, yewa ku bi destê îne bikew-  
têne xefelney, serebirneyne û zuqum  
neyne. Xura herî, qantirî û bergûrî kîş-  
têne û di televîzyona de vatê ma endê  
terorîstî kîşte. Rebiyo ti nêwerdê.

La yê dewicê rebenî. Eyro zehfî îne  
di kûcanê Amede de vînena. Bêkar, bê-  
emel û bêçare geyrenê. Ez carna balê  
xo danê dewican; wexto ku çîmê îne  
kuno ra polisyan, eskeran, tîman yan zî  
wesaitanê îne, binê çîmandir tûj, tûj  
anênê û dindananê xo li îne seqênênê.

Pirtûkeke hêjayî danxwendina li dibistanan:

# 'Paradigmanın İflası'

**W**eşanxaneyê Dozê, çapa pênçemîn a pirtûka Fikret Başkaya ya bi navê 'Paradigmanın İflası' di rêşemîya 1996'an de derxist. Çapa yekemîn a vê pirtûkê jî di avrêla 1991'ê de dişa ji aliyê vê weşanxaneyê ve hati bû çapkirin.

Berê ev pirtûk jî aliyê ebadên (pîvanên) xwe ve dişîbiya pirtûkên dersan ên dibistanan. Tabî li gorî min, ji aliyê naveroka xwe ve hêjayî danxwendina li dibistanan e, lê şekl û pîvana ku vêga hatiye bikaranîn, jî berê xweştir û delaltir e; jî 13.4x19.5 cm pêk hatiye. Ev pirtûk bi zimanê tirkî hatiye nivîsîn. Ji 13 beş û ji 344 rûpelan ava bûye.

"Şêr, heta ku bibin xwediyê dîrokzanê xwe, wê çîrokên nêçîrvaniyê her tim pesnê nêçîrvanan bidin." (Gotineke pêşiyên Afrîkayê)

Ev pêşgotin ku di destpêka beşeke vê pirtûkê de hatiye bikaranîn baş tîne zimên ku, divê mirov xwedî li dîrokê derkeve û bi awayekî objektîv li rastiyên dîrokê bikole. Li gorî min ev pirtûk jî, mîna keke baş e ji bo vê yekê.

Pirtûk, bi giştî rexneyan tîne îdeolojîya fermî ya dewra Komara Tirkiyeyê.

Rewşenbîr û entelektuel çî ne? Di îdeolojîyên fermî de tewr û dubendiyên rewşenbîran çî ne? Îdeolojîya emperyalîstan xwe çawa dida qebûlîkirin li welatên mêtîngeh an jî niv-mêtîngeh û jî ber vê îdeolojîyê jî, çî encam derdikewin li wan welatan?

Rewşa kurdan berê çawa bû, piştî ku Komara Tirkiyeyê hate avakirin çî dek û dolap li ser wan hatin gerandin? Rengê rejîma kemalîst çawa bû û jî aliyê kesên kemalîst ve çawa tê parastin?

Dirûvê CHP'ê ya di dewra yekparçî-

tîyê de çawa bû û çî tîkiliyên wê bi dîktatoriya kemalîst re hebûn?


Laîkbûn bi çî awayî hate fêmkirin û bi navê laîktîyê çî pest û pêkutî li ser gel hatin meşandin?

Hêzên ku hilberîne dikin, polîtîkaya wan a îktisadî bi çî awayî ye?

Bi giştî Fikret Başkaya der heqê van mijaran de rexne û nîrxandinên xwe bi dorfirehî tîne zimên û mejiyê xwendevanên jî gelekî zelal dike der heqê van yekan de.

Jixwe nêçîrvanên 'binavûdeng' jî ber ku naxwazin şêr xwedîtîyê li dîroka xwe bikin, jî ber vê pirtûkê 20 meh cezayê hepsê, 41 milyon û 666 hezar lîra jî cezayê pereyan dan Fikret Başkaya; di sala 1993'an de.

Gerçî Fikret Başkaya cezayê xwe 'kişand', lê jî ber ku îmkana nêçîrvanên e ku bi temamî vê pirtûkê jî holê




rakin, ev pirtûk hê jî tê çapkirin û li hêviya xwendevanên xwe ye.

*Cihê ku ev pirtûk jê bé xwestin:*  
Doz Basım ve Yayıncılık Ltd. Şti.  
Tel-Fax: (0212) 245 41 37

NUR-HAYAT

## YRWK û karê rûmetî

MEDENÎ FERHO



**E**v her çar tîp kurtenavê yekîtiya rewşenbîrên kurdan nîşan didin. Di pir hêl û mijaran de dengê xwe derxistîye û her kes jî wê nas dike. Ne bes kurd bi tenê, dijmînê kedxwar û zordest jî. Di nava temenê şoreşa kurdî de temenê vê sazîyê jî ne hindik e. 8 sal... Di nava van salan de pir rewşenbîr jî berhembêz kirin, qenc-xerab, kê-m-zêde civînên giştî û dorfireh, çî konferans û çî civînên taybet pêk anin. Ev sazî, bû sedema pir sazîyên pişeyî û karbendiyên xas jî. Hê jî ev encama avaniyên ku di avakirina dewletî de dibin ristin û honandina bingehe di rewşeke pirhêlî, dorfireh, pirdengî û pîrhewnî de berdewam dike.

Mînak: Meşa rewşenbîran. Rojek û karekî dîrokî bû. Bal kişandê ser sedemê û deng jî da. Dijmîn jî ricifîna xwe û zexeliya ûrê xwe di pêkanîyên wê roj û şevê de, bi êrişên ser salonê nîşan dan. Û hwd... Yekîtiya Hiqûqnasên Kurd û Yekîtiya Rojnamevanên Kurd jî nava vê sazîyê pişikivîn û kat dan. Hêviya me ew e ku mîweyên van sazîyan nêzik, ne dîr derkevîne holê. Berî wan jî hene. Piştî wan jî wê hebî. Mîna Yekîtiya Nivîskarên Kurd...

Belê, YRWK di 26 û 27'ên meha borî de, yanê di avrêlê de civîneke taybet da amadekirin. Di civîne de li dora sed rewşenbîrî jî her beşê Kurdîstanê beşdar bûn. Piraniya van rewşenbîran ne bes kesên bi krawat û kesên xwe pîpîkandî û kubkuba bûn. Kesên xwedî ziman û hewnên tîrnîqaş û guftûgo bûn. Di her mijarê de pirdengî û awazên ji hev û din cuda derdiketin meydanê. Vê pirdengî û awaziya pîrengî pirani xwe di biryarên ku di civîne de bêne standî da xuyakirin.

Ji ber ku, piştî diwan hate hilbijartin

pêşniyaza qerara hêrivandî û ji nû ve avakirina YRWK'ê hate holê. Li hemberî vê daxwazê pir kesan di hêla dadî û mîsyonî de dîtînen xwe diyar kirin û hate fêmkirin ku civînen taybet nikarin qerarên kongreyî bistînin. Civînen wîlo bes dikarin pêşniyazên giştî di encameke rapoerî de bibîne kongreyê. Her wiha, li ser mîsyon û karbendiya YRWK'ê jî hate rawestîn. Di vê civîna taybet de du raman û dîtin hebûn. Yek: Felişandin û hilweşandina YRWK'ê, yan jî bi awayekî nûjen bête guhertin. Du: YRWK mîsyona xwe xelas nekiriye, di berxwedanê de rolek leyistîye û hinek berhem û dunde jî derxistîne meydanê. Heger hinek kesan şêzna xwe ya nexweş nîşan dabî jî û YRWK bi honandin û ristina polîtîkî tawanbar kiribî jî, îro hate xuyakirin ku, ew kes êdî di nava dunde û avaniyên vê sazîya dayîk de cihê xwe digirin. Tê vê maneyê ku nêzikbûna kurdan ji kumreşîya wan tê.

Gavên polîtîkî zû tene guhertin û li gorî demê tîne avêtin. Îro jî wîlo ye!... Heger sazî û dezgehên pişeyî bîn lidarxistin jî, ew endamên di van sazîyan de cihê xwe digirin, bi rewşeke xwezayî dibî endamên van sazîyan. Yanê YRWK bibe avaniya danasîn û tîkiliyên di navbera rewşenbîrên kurdan de. YRWK bimîne avaniya serbilindiyê. Karê wê wekî ku ereb dibêjin 'el cem'îye el amme; bibe tîkiliyên rûmetî û pêkanîna navbera kesên bi navûdeng û danûstandina ramanî... Formulasyoneke wîlo dibê parastina sazîya ku sembola şoreşê ye jî. Gelên cîhanê tevan sembolên wîlo parastine. Baweriya min jî ew e ku YRWK mîsyona xwe dikare di hêla tîkiliyên rûmetî û danûstandî de û ne pir, salê carekê an jî du caran bi civînen giştî û di rewşeke pîrozî de pêk bîne. Mînak; ev roj dikare bibe roja Canfedayên Kurdistanê, dikare bibe roja Apê Mûsa, dikare bibe danasîn û xelatgîriya roman, helbest, çîrok, an jî nivîskarekî. Her wiha di vê rojê de xelat jî bê dayîn û kesan jî li hev û din bide civandin. Êdî, karê YRWK'ê namîne polîtîk, dimîne sembol û pêkanîna serbilindiyê...

Ev her du dîtin bi guftûgoyên xurt û pîrcarî bû biryara civîne ku di roja kongreyê de bibe

pêşniyaz. Pir biryar hatin standî. Hinek ji van biryaran li ser xurtkirin û bihêzkerina sazîyan bûn, hinek jî li ser konferansên ku ji terefî Enstîtuya Berlîne ve hatibûn amadekirin û ragihandîne bûn.

Rawestandina li ser zimanê kurdî û wergera hinek pirtûkan li zimanê kurdî jî, bala beşdarên kişand. Ya herî girîng ku li ser hate axaftin, biryara damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd bû. Ji bo komiçka pêwendîyan û di damezirandinê de cihgirtina dorfirehî û pir kesî hate holê û biryar di vê hêlê de hate standî. Dilşahiyeke û bextiyariyeke dî jî ev bû ku, ragihandî li ser kovareke nû ya wêjeyî ku wê di demeke nêzik de bête weşandin, hate kirin. Ev gav ji bo wêjê û çanda kurdî pîroz û giranbîha ye. Çand û wêjê bi derxistin û weşana kovaran xurt û bi hêz dibê. Kovar dibistanên nivîskaran in. Kovar stûna avaniyên çandî û wêjeyî ne. Pêpelûkên berhemên mezî û mîrên çê ne. Honandin û ristina berheman dezgehên kovaran in...

Bêguman kurd pêwistî hinek gavan bûne. Pirani rewşenbîrên kurd. Êdî dem nemaye dema bîdengiyê. Ew reşîya li ser rewşenbîran gerek e bê hilandin. Rast e, hinek dîtin û nêzikbûna li hemberî rewşenbîran bi kumreşî û rexnegîriyeke giran çêdibû û hê jî berdewam dike. Lê li welat, rewşenbîran bedeleke pir giran daye. Derî welat jî, rewşa rewşenbîrî derdekî kuşinde ye. Lê, ev kuşindeyî hin bi hin ber bi bicaniyê ve diçe. Rêxistin û komên xelkê jî gerek e vê rewşê bibînin û ferezandê bidin vê bicaniyê. Her dem rexne baş e, lê her dem guvaştî û kurkusandî ne baş e. Her tîştî di cihê wê de û di dema wê de. Heyam êdî bûye ya tîkîlî û danhevê. Heyam êdî bûye bi hev û din re bez û meş...

YRWK, dikare vê mîsyonê li ser milên xwe bike. Dikare vî karê neteweyî û pîr pêwistî hilgire. Bibe tirata yekîtiyê û biratiyê... Dergehê xwe bike dergehê aşî û tîkiliyên navbera kurdan. Avakirin û damezirandina sazîyan zor e. Lê hêrivandî û felişandinê pîr hêsan e. Em ne li hêrivandî û felişandinê digerin, em li avakirin û damezirandinê digerin?..

# Çiqas dilê mirov pê dişewite!..

**G**otina tirkan e: "Düşmez kalkmaz bir Allah." Rast e. Divê mirov bi ketina tu kesî şad nebe... Lazim e mirov bi destê ketiyan bigire, lê ev şeytanê korê naletî jî mirovan rihet bernade! Dema hinek tiştên fên bîra mirov, rastî û şaşî tevlihev dibin...

Di wê demê de rastî çî ye, şaşî çî ye? Xwedê bide!..

Lê Xwedê nade!..

Te hew dît ku şaşî (ketina hinekan) wisa li xweşiya te hat û jî kêfan di wê deqe û saetê de bezê li ser dilê te heliya...

Dema gotina "Me siya terorîzmê jî ser parlemenê hilda!" tê bîra me, dema tê bîra me ku li ber deriyê parlemenê polis çawa bi piştê stuyê parlemenê me digirt û ew didewisande otomobîlê, em bi ketina halê Çillerê vê gav şa dibin!.. Ji bo "Zeyneba Zer" kes nabêje "çî heyf!"

Ya Rebî tu vê ji me re guneh ne-nivîsînî! Amîn!..

\*\*\*

Ez ne şaş bim, di rojnameya Yeni Politikayê de bû; nivîskarê me Şêx Abdülmelik Efendî, li ser wezîrê dewletê Necmettin Cevherî ku aqilmendê Serokwezîra tirkan Tansu Çillerê bû, ma-



kaleyek nivîsandibû.. Abdülmelik Efendî, di dawîya makaleya xwe de, li Necmettin Cevherî wiha bang dikir: "Cewherî, Cewherî! Tu ne cewher î!

Tu paçê devê qûna Çiller î!.. Di van rojên dawîn de dema mirov dibîne, ku çawa ev bozegur wekî ku di rojên zivistanê de, li ser çiyayê bilind û bi berfê rapêçayî birçî mabin û mîna

ku yekî mistek xwîna germ li ser dêlegura wan reşandibe; wisa har û dîn, êriş dibine ser "dêlegura zer" û wê pirtî pirtî dikin, mirov bêhemdê xwe difikire:

Gelo ev zerî, paçê devê q... kê bû?

Û gelo ew bêbext û bêxîret kî ye ku di nav puntoyan de paçê wî çirtî pirtî dikin, carekê nazivire, lê nanêre?!

Dibe ku yê paç avêtibe, xwediyê paç bi xwe be? Dibe, çima nebe! Belkî, jî ber ku zêde bi kar aniye, zêde jî bêhn ketibe paç, êdî nema dilê wî ragirtibe, hildabe avêtibe!.. jixwe êdî ne dewra paçan e, mîlet kaxiz bi kar tîne!

Rebenê, ew çend bi wî dengê xwe yê melûl û zelûl got "Em yek xîçik nadin, em can didin, lê xîçik nadin!" û dema wekî şêran got "Ew al dadikeve, ew leşker diçe!", çawa wî gawirê yewnan ala xwe avêt û baz da! Mixabin, ku di-şa jî nekarî xwediyê paçik razî bike!

Wê, Leyla avêtibû nav guran, bes Leyla tev dasî derket, di gewriya wan de ma... Lê çawan diyar e, di wê de dasî jî nîn in, wekî havyarê wê di devê bozeguran de bihele, here!..

Çî heyf! Çiqas dilê mirov pê dişewite!..

Nirç, nirç!..

RAHMÎ BATUR

## XELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (18)

## XAÇEPIRSA


Wêr yanê di wêr de	H	Zarê	J	Avêrê	L	Gelêrê	O	A	U
Sawêrê	K	Makrê	T	Pîrê	S	Çavê	A	Y	A
Mîrê	L	R	T	B	A	W	E	R	
Xîrdanê	P	J	M	E	T	E	L	O	K
Înanê	E	Y	N	T	L	P	E	R	
Înanê	A	S	A	N	I	N	I		
Înanê	E	V	I	N	K	I	N		

PEYVA VEŞARÎ

Şehideki nemir (wêne)	Niqte	Gihanekek	Qeyik	Manewî	Nexweş-neke çermî (pirzik)
Gelî	Niştiman	Sewalek, heywanek		Pê tîr diavêjin	
			Minak Şikefta sewalên kuvi		
Rind, xweşik				Lesar, lemîşt	
Hevraz		Ajneber			
		Heyat			
Jan				Celebeke qeyikan	
Xwişka dê				Navek	
		Notayek		Li stuyê dewaran dikin	
		Sewaleke keffî		Paşgîrek	
Menzel	Sembola Neonê		Sembola Samaryûmê		
	Cephe		Dîn		
		Gilî û gazin			
Paşgîrek					
Beşek ji mil		Eko, belavbûna deng			
				Sembola Neodîumê	

### Bersiva Xaçepirsê (16)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînîn û bi rîya pişkê li 10 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 18'an kaseta "Civata Dengbêjan" e.



Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Kesên ku xelata xaçepirsa 16'an Kasetaya Koma Çiya "Dilana bê sînor" qezenc kirine: Mehmetşah Amedî/Izmir, Ömer İlhan/Mardin, M. Yıldız/Diyarbakır, Veysi Gülcan/Mardin, İbrahim Altınışık/Batman, Dilan Çelik/D.bakır, Osman Daş/Bartın, Zeki Bazidî/ Ağrı, Adnan Sincaroğlu/Bartın

PEYVA VEŞARÎ





# Guherîn û guhartin

**Hûn çi bikin, em nayên guhartin. Xwedê em çer çêkirine, werê ne. Ev 70 sal e hûn bi dibistanên xwe, bi mamosteyên xwe, bi radyo û televîzyonên xwe, hûn dixwazin me biguherînin, lê belê em nayên guhartin.**

**Em bi halê xwe razî ne. Dev ji me berdîn, ji nav me derkevin.**

**E**z ji wan du peyvên ji qet hez nakim; guherîn û guhartin (bi tirkî "değişmek" û "değiştirmek"). Ji bo çi guherîn û guhartin? Gelo tengasiya we çi ye? Hûn çima ketine telişê yeke mezin? Kê guhartin ji we xwestiye? Kî diguherînin, an jî didin guhartin?

Em guhartinê naxwazin. Xwedê em çer afirandine, bila wer bin. Hûn ji Xwedê baştir nizanin... Hem çiyê we ji me baştir e ku hûn dixebitin ku me wekî xwe bikin. Yanê bikin tirk. Qet beredayî mexebitin. Em bi Xwedayê xwe sed carî şukur dikin ku, em kurd xulq kirine.

Di neslê kurdan de nêzikî 20-25 pêxember hatine dinyayê. Ew qas ewliya û enbiya hene. Di dîroka me de pir kumandar, zane, civaknas, dîrokvan, hunermend, mirovperwer û niştimanperwer û hwd. hene. Di aliye tendûristiyê de, di aliye zanistiyê de, di aliye dîrokî û aliye civakê de xebatê girîng kirine û anîne holê.

Hin kes nizanin bixwînin û hu (hîn) bibin. Tekerlekê çêkirîye; sewalên hovê kedi kirine; erd, belê kê ajotiye? Hespê kedi kirîye û şuxulandiye. Ga kê berê pêşîn kirîye cot. Kê bizin û mih xwedî kirine, jê şîr dotîne?

Gelê me li ser ilmê erd û ezman xebatên girîng kirîye. Der heqê roj û heyvê de; der heqê sal û meh û hefte û rojan de kê encamên zanistî derxistin holê? Ew navê rojan ku (çarşamba, perşembe) hûn bi kar tînin, we ji ku anîne? Carekê bi xwe bîponijîn, ew çi ye hûn dikin...?

Ka bibêjin we ji xeynî dizî û derewan ji insanetiyê re çi xebat kirîye? Qet ji bona rindî û duristiyê xebatên we hene?

Hûn jî bibêjin? Karê we yî herî baş, dizî û derew in. Hûn dixwazin me wekî xwe bi-

kin. Xwedê neke em wekî we bibin. Qet hûn şerm nakin navê çiya û newalên me, navên mîrg û kaniyên me, navên çem û golên me we guhartine. We çandîya me dizî, we dîroka me winda kir, we gund û bajarên me, dehl û daristanên me, çiya û mîrgên me şewitandin. Cih û warên me jî holê rakirin. Gelê me koçber kir. Wê jin û zarok û malên me bîxwedî hiştin. Xwedê bela xwe bide we. Hûn ji me çi dixwazin?

Karê we dizî û guhartin e. Karê we ye guhartinê jî, birayê dizîya we ya mezin e. We li Asyaya Navîn ji wer kir. Gelê çînê hûn ji Asyaya Navîn kirin der. Hûn hatin penahendeyî kurdan bûn. We got "Em misilman in, hûn jî misilman in, me biparêzin." Kurdên bêaqil hûn hezar salî parastin. Heta niha jî hûn kurdan qir dikin.

Li çarmedora xwe binêrin, dostê we kî ne? Carekê din bîponijîn, hûn xerab in an ew gelên din? We li Ewrûpayê, li Afrîkayê jî wer kir, hûn jî her derê derxistin. Hûn dîsa hatin ketin bin siya kurdan. We digot "Em birayê hev in", niha jî birayên we siyonîst in.

Hûn çi jî bikin, em nayên guhartin. Xwedê em çer çêkirine, werê ne. Ev 70 sal e hûn bi dibistanên xwe, bi mamosteyên xwe, bi radyo û televîzyonên xwe, hûn dixwazin me biguherînin, lê belê em nayên guhartin. Em bi halê xwe razî ne. Dev ji me berdîn, ji nav me derkevin. Wekî din em ji we îhsanekê naxwazin.

Ev cara çendan e ku bi me kurdan dikin. Dixwazin koka me qut bikin, lê belê em careke din li ser koka xwe geş û gurtir hêşin dibin. Şitilên me hûn geş û gurtir vedikin.

Serkomarê we Demîrel bi xwe got, "ev serhildana 29'an emê wê jî qir bikin." Dîsa jî qir dikin...

Wisa ye, 28 car e hûn qir dikin. Lê dîsa va ye em li vir in. Em namirin. Em xurt dibin, jîn dibin. Hûn ji kirina xwe fedî nakin. Ji Xwedê natîrsin. Ji alemê şerm nakin. Ji me çi dixwazin?


Erdê Kurdistanê bêxîretî û teresiyê napejirîne. Hûn careke din li dora xwe binêrin, kesî din wekî we heye? Kes zimanê kesan qedexê dike? Her însan bi zimanê xwe diaxîve. Zimanê me baş e, ne baş e ji we re çî? Çima qedexê dikin? Ger hûn ji însanan fêm nakin, bala xwe bidin sewalan. Belkî hûn ji wan aqil bigirin. Lewre sewal jî bi zimanê xwe diaxivin.

Ev nexweşiya dizîn û guhartinê, ji kalên we, ji we re maye. We ola îslamê guhartiye kirîye laîk. Laîk çi ye? Oleke laîk nîn e, we laîk ji ku anî? Pêxemberê vê olê kî ye? Kitêba vê olê çi ye?

Hûn pir tiştên sosret diafirînin. Heta niha we gazî îslamiyan dikir. Digot "Werin li Bosna-Hersekê, li Çeçenîstanê li misilmanan didin; em bibin, yek alîkariya wan bikin." Ev hîn neqediya, vê carê jî bi cihûyan re peyman îmza kirîye. Li başûrê Lubnanê li misilmanan dixin. Hûn çi ne; ji çî olê re xizmetê dikin. Eşkere bibêjin, bila her kes we nas bike. Hûn çi tiştê ecêb in. Di nav alemê de hûn bûne gosartme. Hûn dixwazin me jî wekî xwe bikin.

Qet neteweyê wekî we nehatiye ser rûyê erdê... Ha Coşkun Kirca dibêje zimanê kurdî tune ye. Kes jê napîrsê: "Kirca, li ser ziman çend lêkolîn û çend lêgerînan we hene; hûn ji zimanzanistiyê çî fêm dikin? Zimanê kurdî tune ye çima hûn qedexê dikin? Tiştê tune be çawa tê qedexekirin?" Careke din bîponijîn. Hûn bi xêra kurdan heya û niha li ser piya sekinîne. We xwe li Anadolê bi şûn kirîye, îro jî me dikin der. Pêşgotineke we heye, dibêjin: "Yavuz hirsız, ev sahibini bastırır (Dizê jêhatî, xwediyê malê diçewisîne.)"

Ev hewldana we faydeyekê nade we. Werin em bi biratî û aştî û wekhevîyê bi hev re bijîn. Ji me gotin.... Berpîrs hûn in. İLOYÊ NEPERE



Bêhemdî nehatiye  
gotin ku mezopotamya  
dergûşa şaristaniyê ye.  
Ji vê gotinê re Bajare  
Heskîfê bi serê xwe  
bi tenê delîlek e.  
Dîroka vê devera hanê  
ji dema kevnare ve  
dest pê dike.  
Heskîf ku ji Êlihê  
bi 20 km. dûr e,  
yek ji navendên  
cîhûwarbûna  
herî kevn ên dinyayê  
tê hesibandin.

# Barajerekî kevnare û dîrokî Heskîf

**H**eskîf, navçeyê Kurdistanê ye, ku ji aliyê dîroka xwe ve, ji şaristanên herî kevnare ye. Bi salan e ku, der barê dîroka avakirina navçeyê de, lêkolîn têne çêkirin, lê mixabin heta vê gavê, agahiyeke baş î rast di destan de tune ye. Ev naçeya me ya dîrokî niha ji aliyê îdarî ve li ser Êlihê (Batmanê) ye û bi tirkî jê re dibêjin "Hasankeyf".


Tê diyarkirin ku ev jîngeha kevnare, bê kêmahî, 1500 sal e ku ji mirovatiyê re bûye cih û war.

Li gorî agahiyên heyî, tê dîtin ku, "Kela Heskîfê" piştî Zayîna Îsa (P.Z) di sedsala 4. (çaremîn) de hatiye avakirin. Di vê sedsalê de, Kumandarê Bîzansê Konstantîno, dema Amed û derdora wê dixê bindestê xwe, ji bo parastina herêmê, 2 kelan ava dike. Kela Heskîfê jî, ji wan kelan yek e.

Heskîf li gorî salnameya hîcrî, di sala 17'an de ji aliyê emewîyan ve hatiye fetihkirin. Piştî vê mêjûyê, ebbasî, hemîdanî, merwanî, artûqî, eyyûbî û osmaniyan li herêmê, di demên cur bi cur de li ser navçeyê hikum kirine. Heskîfê, demên xwe yê herî dewlemend û ronî, di dema artûqîyan de derbas kiriye.

Mêjûya hevnasîna Heskîfê û tirkan sala 1071 e. Di şerê Malazgirê de ji kumandarên Alparslan, Sökmenê kurê Artuq dema Mîrîtiya Artûqê ava dike, Heskîfê jî dide ser mîrîtiyê xwe. Piştî bidestxistina Amedê jî, Heskîf nêzîkî 130 sal ji artûqîyan re paytextiyê dike. Di sala 1232'an de, ji hêla eyyûbîyan ve dawî li dagirkeriya artûqîyan tê.

Dewleta eyyûbîyan, piştî destxelatdariya xwe ya 30 salî, li hemberî êrîşên moxolan ji holê radibe. Heskîf jî, para xwe ji vê yekê distîne û wêran dibe.



Piştî eyyûbîyan, bajar dikeve destê akkoyunliyan. Heta destpêka sedsala 15'an jî, qesr û sarayên mîr û dagirkeran li herêmê dihate avakirin. Kurê Uzun Hasan, Zeynel Beg ku ji kumandarkî akkoyunluyan bû, dema di şerê Otlukbeylî de tê kuştin, li Heskîfê tê definkirin. Ev tîrb îro jî li herêmê bi nav û deng e. Heskîf, piştî dagirkeriya akkoyunluyan, demeke kurt be jî, ketiye destê sefewiyên îraniyan. Di sala 1516'an de jî, dagirkeriya reş û tarî dest pê dike û

Heskîf dikeve bin destê osmaniyan.

Îro ev bajarê kevnare ku ji bilî kurdan ji gelek qewman şop û bermayî lê hene, li ber xetereyê mezîna e. Ji ber ku ew binav dibe, dikeve bi bendava Îlisuyê. Heke ev bajar li Ewrûpayê bûya wê bibûya muzeyê siruştî, bêyî ku destê xwe bidana tiştêkî wê. Lê çi mixabin ku qedr û qîmeta vî cihê kevnare nayê zanîn!

SALIHÊ KEVIRBIRÎ